

# berbang

Kovara Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê



# BERBANG

Organ för Kurdiska Riksförbundet  
Organa Federasyona Komelên Kurdistanê  
li Swêdê

Ansvarigutgivare/Berpirsiyar:  
N. Kirîv

Redaktion/Redaksiyon:  
A. Tigrîs, Aso Germiyani, Cemşid  
Heyderî, L. Cengîn, Hesenê Metê,  
Mahfûz Mayî, M. Alî K., Rohat,  
Temo Zêrîn

Amadekarê Beşa Zazakî:  
H. Diljen

Sättning och Layout:  
Bavê Rojbîn, C. Heyderî, N. Kirîv

Adress:  
Box 45 205  
104 30 Stockholm/Sweden

Telefon: 08/668 60 60

Postgiro: 64 38 80-8

Prenumeration/ Abonetî:  
Kes/Enskilda: 100 Skr/sal/år  
Meqam/Myndigheter: 200 Skr/år

Annons/Îlan:  
Rûpelên navîn/Insidor: 1000 Skr

Redaksiyon ne berpirsiyara nivîsarên  
bi înzê an nivîs û gotinên Federasyo-  
nê ye. Nivîsarên ku ji Berbangê re tên  
şandin, heke çap jî nebin, li xwedî  
nayên vegerandin.

ISSN - 0281-5699  
Sal: 10, Hejmar: 2/91 (70)  
Mars -1991

Apec tryckeri-Stockholm

## Naverok

Beşa kurmanciya jorîn .....	Rûpel
<i>Kurd û realîzma ne realist-N.Kirîv</i> .....	3
<i>Dunyayê Kuweytê rizgar kir, Pêşmerge jî Kurdistanê rizgar dike- L.Cengîn</i> ..	4
<i>Mam Hejar wefat kir</i> .....	7
<i>Gelo zimanê kurdî serbest an qedexe dibe?</i> .....	8
<i>Qasimlo û rojnamegeriya me-Xorto</i> .....	15
<i>Kongra 11-an bihêztirîn civiya</i> .....	16
<i>Hevalê xebatkar Mehmet Altan wefat kir</i> .....	18
<i>Berbangê çawan -2-</i> .....	19
<i>Bîranîna qehremanê kurd Simkoyê Şikakî -Kerîmê Husamî</i> .....	22
<i>Kompîtur û zimanê kurdî -Amed Tigrîs</i> .....	26
<i>Dilê şikestî (Çîrok) -Firat Cewerî</i> .....	27
<i>Weşanên nû</i> .....	29

### Beşa zazakî (dimilî)

<i>Camêrdo nêmerd Necmettîn Büyükkaya -Koyo Berz</i> .....	30
<i>Diyarbakir ra roj bi roj -Hesenî Gîran</i> .....	32

### Beşa kurmanciya jêrîn

<i>Koç (çîrok)-Rêwas</i> .....	37
<i>Şemendefer (çîrok) -Dr. Kurdo Husên</i> .....	39
<i>Wite be nixekanî dapîre...</i> .....	42
<i>Ew Şîraney derewnewe -R. Sêweylî</i> .....	44
<i>Wergêran yan helbizirkirdin -Beroj Akreyî</i> .....	46
<i>Goşey Tenduristî</i> .....	48
<i>Kongirey Fîdrasyon...</i> .....	49
<i>Kêşey Kurd û Konfrensî Stockholm</i> .....	51
<i>Raperîni xelkî Kurdistan - C. Heyderî</i> .....	53

### Xwendevanên Heja!

Ev hejmarê Berbangê, li ser navê redasiyona kevî derdikeve.  
Redaksiyona nû dest bi xebatê kiriye. Hejmarên piştî wê, dê li ser  
navê redaksiyona nû derkeve.  
Hûn dikarin di derheqê xebata redaksiyonê de pêşniyar, rexne  
û daxwazên xwe bi nivîskî bikin.  
Bi silavên birati  
Berbang



## Kurd û realîzma ne realîst

Piştî ku hêzên hevkar bi şer, Iraqê ji Kuweytê kirin der, li Iraqê û Kurdistana Başûr ji raperîna gel destpêkir. Cara yekem Kurdistana Başûr, bi tevî bajarên xwe yên mezin, ket bin kontrola gelê kurd. Lê çî heye ku li dunyaya siyasetgerên durû, gelê kurd dîsa bi tenê ma. Dîsa eşkere xuya kir ku dema gotin were ser mafên kurdan, ew siyasetgerên hemû dewletan yên ku parêzgerên "aşîtiya dunyê", yên ku parêzgerên "mafê însanî" û "demokrat" in, bê deng dimînin. Ev bêdengîya wan ji ber çî ye?

Gelek kes bi hêsanî dikarin bersîv bidin ku bêdengî ji ber berjewendîya aborî ya dewletan e. Belê para berjewendiyên aborî heye. Lê bi bawerîya min, ev ne faktora sereke ye ku bi serê xwe mestirîn rol bilîze. Eger wusa bûya, bi tenê parça Kurdistana Başûr, ji dehan dewletên dunyayê dewlementir e. Pêwendiyên dewletên dijmin bi dunyayê re jî ne mezintirîn faktora bêdengîyê ye. Di vî warî de, Îsraîl bi serê xwe nimûneyek baş e. Îsraîl, ji aliyê berjewendiyê aborî de, ne ew çend dewlemend e ku hemû dunya piştgirîya Îsraîlê bikin. Û ji aliyê peywendiyê dijminên Îsraîlê bi dunyayê re jî, Îsraîl xwedî dezawantej e. Ji ber ku hemû dewletên ereb him bi awayekî resmî hebûna dewleta Îsraîlê nasnakî û him jî her û her dijminatîya Îsraîlê dikin. Îcar çima piranî piştgirîya Îsraîlê dikin? Ez bi xwe li ser difikirim.

Sedemên bêdengîya dunyayê du alî ye. Aliyek siyaset, berjewendî û pêwendiyên dewletên dunyayê, aliyek din jî siyaset, berjewendî û pêwendiyên kurdan bi xwe ye. Û bi ya min aliyê duyem mestirîn rol dilîlîze. Bi giştî tevgera kurd di pir warî de xwedî kêmasîyan e û ev kêmasî bi xwe dibe sedemên gelek encamên negatîf. Divê tevgera kurd û her welatperwer li ser wan kêmasîyan raweste û wan nasbike.

Yek ji kêmasîyên me, şaşîya daxwaz û hedefên siyasî yên tevgera kurd e. Kurd di daxwaz û hedefên stratejîk de "realist" in.

Piştî ku dewletên derûdor Kurdistan îşgal kirin û di nav xwe de parvekirin, kurd jî her serfî hildane. Pîrî cara di despêkê de ji aliyê eskerî de biserketine, lê ji ber qelsiya siyasî, kurd tu carî negihîştine armanca xwe. Şûna ku taktîkên xwe li gor parçebûna Kurdistanê tesbît bikin, armanca û xebatên xwe yên stratejîk li gor wê tesbît dikin.

Belê, divê mirov nasîna îmkana û rewşê de realist be. Lê divê ev yeke jî baş bête zanin ku mirov di daxwaz û hedefên xwe de jî her û her îdealîst e. Ser qissê, daxwaza me ya otonomî, an federasyon û an jî dewleteke serbixwe; ji ber ku yek ji wan di realîtê de tunene, hemû jî daxwaz in, îdeal in. Kî daxwazek ji wan daxwazan biparêze, îdealîst e.

Helbet ev îdealîzma me divê bîngeha xwe ji realîta me bigre. Û berbiçavtirîn realîta me jî ew e ku pîrsa kurd, pîrsa welatekî û milletekî ye. Ne pîrseke hundurîn ya dewletên dagirkeran e. Ev realîte, bîngeha realîstbûna me ye.

Îcar dewletên dunyayê ne realist in. Dewletên dunyayê pîrsa kurdî pîrsa hundurîn ya dewletan qebûl dike û loma eşkere piştgirîya tevgera kurd nake. Ji xwe tu peyman,

biryarên navnetewî û bîngehên huqûqî jî tune ku dewletek alîkariya pîrseke hundurîn ya dewletekî din bike, eger hukumeta merkezi alîkariyê nexwaze. Di vî warî de alîkariyên ku tên kirin jî wekî em dizanin alîkariyên veşartî û aborî ye!

Tevgera kurd jî, her weha pîrsa kurd wekî pîrseke hundurîn ya dewleta dagirker qebûl dike. Û ji aliyê eskerî de Kurdistanê rizgar dike, lê tu carî rêyeke rizgariya siyasî nabîne. Tevgera kurd çiqas bi hêz dibe bila bibe, çareserkirina pîrsê bi tenê dimîne raya rejîma merkezi. Li erdê rizgarkirî tevgera kurd bîray, li benda raya rejîma merkezi dipê. Rejîma merkezi jî, ku li hember tevgera kurd qels bikeve, bêdeng dimîne heta ku bikaribe plan û hêza xwe li dijî tevgera kurd pêkbîne. Nimûne gelek in: 1970, 1980 û îro Kurdistanê Iraq, 1978 Kurdistanê Îran.

Û realîteke din: daxwaza tevgera kurd an otonomî, an fererasyon, an jî dewleteke serbixwe, çî debe bila bibe, çî xirabî ji dest dijmin tê, li dijî gelê kurd dike. Li hember daxwaza otonomîyê rejîma Seddam bombên kîmyewî bikar anî. Ku daxwaza kurdan dewletek serbixwe bûya wê Seddam dê çî bikar bîaniya?

**Kêmasîyek din ya bîngehîn ji şaşîya xebatên siyasî yên kurdan li dervayî welêt e.** Pîrî cara tê gotin ku kes kurdan nas nake, divê înfomasyon li ser rewşa kurdan û welatê wan bête belavkirin. Lê dewletên hemû dunyayê rewşa kurdan ji kurdan baştir dinasin. Û dîsa pîrî cara tê gotin ku rojnama, radio û televîzyonên dunyayê qala kurdan nakin. Lê di demên serîhildanan de, bi rojan nûçeyên li ser bûyerên li Kurdistanê, tên belavkirin. Û di ser de kurd jî bi belavok, bi mitîng, bi meş û bi grevên birçîbûnê xebatên protestoyê pêk tînin.. û hwd. Lê Rewş naguhere, tevgera kurd piştgirîyeke xurt nagre, dewletên dunyayê bêdengîya xwe nabirin.

Îro jî, ev çend hefteyên dawî eşkere dikin ku kêmasî çî ne. **Kêmasî xebata piştgirî ya kurdan û naskirin û piştgirîya resmî ya dewletên dunyayê ne.** Loma divê xebatên hemû rêxistin û welatperwerên kurd li dervayî welêt û pêwendiyên bi dewlet û sazgehên navnetewewî re, li gor vê rastiyê ava bibe. Ango tevgera kurd bi du alî divê li dervayî welêt bête organîzekirin: Xebat ji bo piştgirîya tevgera kurd li welêt û xebat ji bo naskirina mafên çarenivîsê ya xelkê kurd ji aliyê dewletên dunyayê ve. Di vî warî de îmkana û azadî ji bo hemû kes û rêxistinên kurd hene. Lê astengek jî ku hemû rêxistin bi hev re li gor stratejîyeke Kurdistanî kar nakin. Her yekê me li gor rîya xwe xebata xwe dimeşîne. Hin alternatîvên baş di warê rêxistinî de wekî Federasyona Kurd li Swêdê, Enstîtuya Kurd li Parîsê û Malbenda li Kurd Londonê hene. Lê ev tîr nakin. Stratejîyeke xebatê û yekgirtîyeke rêxistinî ya kurdan li seranserê dunyayê pêwîst e.

Ku xîret hebe, çima hemû kurd bi hev re li dervayî welêt xwediyê yekdeng û yektevger nebin?

N. Kiriv

# Dunyayê Kuweyt rizgar kir, Pêşmerge jî Kurdistanê rizgar dike!

- Seddam hîn dimîne, lê diyare çûna wî nêzîke!
- Her roj agahdariyên pîroz ji Kurdistanê tên!

Şerê ku dunyayê bi mehan mijûl kir, yê ku di vê demê de, di jiyana siyasî ya dunyayê de, bû pîrsa herî girîng, piştî qebûlkirina ji aliyê Iraqê ve hemû şertên Dewletên Yekbûyîyên Amerika û hêzên hevkar di roja 26'ê sibatê de bi erêkirina Komîta Ewleyî ya Yekîtiya Netewan (YN), bi biryara danîna çekan, rawesta. Lê, her wusa ew nayê wê manê ku şerê Xelîcê bi tevayî qediyaye. Ji bo wê pêwîst e Iraq van 8 şertan bi cî bîne û di demeke kurt de bersiva wan ji Qesra Sipî li Waşingtonê re bide xuyakirin. Evşert di roja 22'ê adarê de, ji aliyê DYA ve, ji bo danezanên ragihandinên cîhanî hatin belavkirin. Li gor wan:

1. Roja Yekem: Komîta Ewleyî ya YN, biryara rêkirina xwarinê ji bo Iraqê qebûl dike. Pêwîstiyên din ên bingehîn di destê Komîta Sezayê de ye, ku çavdêriyê dike, ku çawa Iraq şertên YN bi cih tîne û wusa biryar digre ji bo rêkirina pêwîstiyên din ên bingehîn.

2. Roja Duyem: Serokê YN, Perez de Cuellar bi Iraq û Kuweytê re, li ser vê pîrsa sînorê di navbera her du dewletan de, civînekê dike û biryar li ser vê pîrsê digre. Ew, her wusa biryara danîna hêzên leşkerî yê YN ku çavdêriya pêkanîna vê nuxtê bikin jî, digre.

3. Roja 15'em derengtir: Iraq sistemen xwe yê çekdarî yê giran, çekên kîmyewî û bîyolojî, ji bo YN vedike û her wusa eger amadebûnên Iraqê yê nû hebin ji bo sazîna sistema nu yê çekdarî, pêwîst e, ew jî ji bo YN bêne vekirin.

4. Roja 30'em an zûtir: Serokê YN xesarên ji şer pêkhatî hesab dike, ji bo vê çendê fondekê di damezrêna ya ku xesarên şer ji firotina petrola Iraqê derdixe.



Rêxistinên Însanî yê navnetewî, ji bo rêkirina xwarin û dermanan ji bo Başûrê Kurdistan hîn jî bédengiyê diparêzin. Lê em Kurd çi dikin? Foto: Azad Amedî

5. Roja 45'em an zûtir: Serokê YN, Komîteyê taybetî dê deyne ya ku dê çavdêriya sistema çekên giran ya Iraqê bike.

6. Roja 60'em: Komîta Ewleyî biryara erêkirina, rakirina çend sazayên girîng a embargoya li dijî Iraqê digre.

7. Roja 90'em, an zûtir: Komîta Ewleyî biryara rakirina tevayîya embargoya ku li dijî Iraqê ye digre.

8. Roja 120'em: Serokê YN planeke amade dike, ji bo qedexekirina pêkanîna sistemeke nû ya giran a çekdarî û bikaranîna wê.

Her wekî, ku heta nuha diyar bûye, ku hemû daxwazên Amerîka ji bal Yekîtiya Netewan ve hatin qebûl kirin, di warê pîrsa Xelîcê de, xuya ye ev şertên nû jî beramberî Iraqê, ji bo bi tevayî qedandin û rawestina şer, wê bîn erêkirin. Lê, li aliyê din, ne diyar e ku Iraq

wê çawa bersiva van şertan bide. Tenê yek tiştî mirov dikare bêje ku Iraq ala teslîmîyetê hilda, hîn gelek pêwîst e serê xwe deyne. Alternatîva din jî, wekî ku têkoşîn ji bo destpêkiriye-rakirina rejîma Seddamê Tekrîtî ye.

Mirov, eger bi rêz çavekî ji buyerên ku pêkhatin ji meha 7'an vir de li Rojhilata Navîn û bi taybetî der û dora Xelîcê derbas bike, bêgûman wê bi karteke enteresan û balkêş re berbiçav were.

Bûyera herî girîng û bingehîn, wekî ku her kes dizane wergirtina Kuweytê, di roja 2'ê tebaxa 1990'î bû. Rejîma BAAS û serokê wê yê dîktator Seddam, bi tû awayî daxwaz û hêviyên dunyayê ku bê şer û şert ji xaka Kuweytê derkevê pêk ne anî. Ji ber vê çendê, şeva ku 16-ê çîle bi 17-ê ve girêdide, di seet 00.30 de şer destpêkir. Piştî yek

meh û nîvan şerê belafiran, derbeyeke herî giran li sîstema giran a çekdarî, çekên biyolojî û kîmyewî yên Iraqê xistin. Pêwendiya leşkerî di nav leşkerên Iraqê li Kuweytê û yên li ser xaka Iraqê ji hev birîn. Koordinasyona leşkerî ya di navbera serokatiya leşkerî ya Iraqê û hêzên wan de qut kir û ew ji hev xist. Wekî ku hate belavkirin ji serokatiya leşkerî ya hêzên hevkar li Riyadê- paytexta Erebistana Suudî- ji %80 îrade ya berxwedanê ya leşkerên Iraqê hate şikandin. Her bi ser van hemû tiştan jî, ya rastî li dunyayê tu kesî bawer ne dikir ku mehek û nîv hêzên hevkar ên ku ji nêzî 30 dewletan pêk dihat û bi serpereştiya Amerîka, dê nekaribin Iraqê bi çokan bixin erdê. Lê belê di dawî de, di navbera 100 seetan de şerê erdî, Iraqê 100-hezar leşker wenda kirin, nêzîkî hevqasan xwe teslîmî leşkerên hêzên hevkar kirin û hemû qeyd û şertên YN, Iraqê qebûl kir û xwe ber bi sînore xwe yê berî 1-tebaxa 1990'î ve kişand. Saddam Huseyin Tekrîtî yê ku Kuweyt wekî wîlayeta 19-an a Iraqê dabû diyarkirin, di roja dawîya şer de, di Radyoya Bexdayê de daxuyanî da ku "ji îro û pê de Kuweyt ne wîlayeta 19-an a Iraqê ye". Her wusa, wî di axaftina xwe de da nîşandan ku "çawa leşkerên Iraqê yên qehreman, mala hêzên hevkar wêran kirine û ew mecbûrî, rawestina şer kirine". Lê axaftinên Saddam tiştekek bûn û rastî tiştekek din... Ji şer Kuweyt, welatekî xerakirî yê ku di bin duyê reş ê agirê petrolê yê ku Iraqê şewitand de, ji welatê ku di dunyayê de -welatê herî dewlemend bû- gelekî dûr, derket. Xesara maddî ya Kuweytê her çiqasî hê nehatiye hesibandin jî, xesara tebîetê (ekolojî) ya ku hate dan, bi dehên salan heremê dixin ber bi tehlukayên tebiî, yên ku xetereke mezin in ji bo heremê.

Tiştêkî din ên gelek balkêş, piştî "rizgariya" Kuweytê ew bû, ku gelê Kuweytê yê bi xelasiya welatê xwe, bi pîrozkirinên mezin şa bû, pêwîstbû bi hefteyan li hêviya vegera Emîrê xwe Şeyh El-Sabah bimîne. Belê, îro bûyer jî û encamê wê jî ber bi çav in -Kuweyt, piştî 7-mehan ku bi dehên dewletan jî bo "rizgariya" wê leşkerên xwe xistin şer, welatekî dîsa xwedî sînor û dewlet e. Her çend, ji bo avakirina wê bi salan

wext jî divê, ji nuha ve monopolên Ewropî û Amerîkî, dest bi avakirina wê kirin jî.

### HESABÊN SEDDAM ÊN MALÊ Û SÛKÊ LI HEV DERNEKETIN!

Bûyera din a herî girîng rewşa Iraqê ye. Di dema Krîza Xelîc de weke hate diyarkirin, Iraq bûbû hêza çarem a leşkerî di tevayiya dunyayê de. Her çend Bexda ji şerê 8 salan bi Îranê re, bi deynekî gelek giran -nêzî 100 milyar dolar derket ji- di nav heremê de û bi taybetî jî, di nav welatên Ereban de bûbû xwedî peyvek giran. Li gora Saddam, ev peyva giran pêwîst bû wekî kulmeke li dewletên Ereb yên nexwedî giranî ketiban. Lê, hesabê malê û sûkê li hev derneketin. Hat dîtîn ku welatekî wekî Kuweytê ji -gava pirs tê ser mefaatan- xwedî peyvek û piştgirîyek gelek û gelek giran e. Ji xwe, îro ev tişt ji Iraqê re baş diyar e. Tiştê ku hate serê Kuweytê ji bal Iraqê ve lê hate kirin ji bal hêzên hevkar ve. Tevayiya Iraqê, bi taybetî jî cihên ku, meqerên eskerî ne, bi deh hazarên êrişên balafiran hatin bombardiman kirin. Rewşa jiyane li Iraqê vegeriya sedsala XIX an. Sîstema elektrîkî, ava vexwarinê, sîstema telefon, telewîzyon ji 3/4 an xaka Iraqê hate xerakirin. Ji wan jî zêdetir Iraq wekî welatekî xerabûyî ji şer derket.

Dervî ku hesabê Saddam ên malê û sûkê li hev derneketin, her wusa piştî rawestana şer heta nuha (23 adarê) mana rejîma BAAS bi xwe li ser hukim ne diyar e û şerê opozisyona Iraqê, bi taybetî jî ya Şîyan li dijî rejîma Bexdayê her berferê dibe. Li gor deng û behsên belavkirî, di 22'ê Adarê de, li Baxdayê bi xwe, muxalefetê dest bi çalakîyên leşkerî kiriye û şer di navbera hêzên leşker yên alî Saddam û yên ku li dijî wî ne, heye. Ji aliyê din ve Saddam jî dest bi planên xerîb kirin. Di roja 17'ê Adarê de, di axaftineke televîzyona Bexdayê de, wî nîşan da, ku amade ye ji bo destpêkirina jiyaneke "demokrasi"; damezrandina partiyên cuda di Iraqê de, reform di Qanûna Bîngêhîn a Iraqê, û her wusa mîletê Iraqê wê ji nuha û pê de bikaribe dîtîn û ramanên xwe bi awakî serbixwe û rizgar bîne ziman, rexna hukumetê bike, hatine qebûl kirin. Di vî warî de

Saddam " reforma" xwe ya yekemîn jî, di roja 23'ê adarê de pêkanî. Sadûn Hamedî, muslîmê şîî, yê ku heta nuha alîkarê serokwezîr bû, wekî serokwezîr nîşan da. Tariq azîz, yê ku heta nuha wezîrê derve bû, hat şûna Hamedî wekî alîkarê serokwezîr. Wekî tê zanîn, heta vê rojê Saddamê Tekrîtî hem Serokê Komarê, hem serokê hemû hêzên leşkerî yên Iraqê û hem jî serok wezîr bû. Ew her du wezîfên xwe wê berdewam bike.

Cara yekem piştî şer, hate dîtîn ku germbûna ku Îranê nîşanî Iraqê kir di dema Krîz û Şerê Xelîcê de, ne bi dostaniyek dilsoz hatiye kirin. Ji ber ku, hîn bi rawestina şer, şîyên ku dest bi şer li dijî rejîmê Saddam kirin, ji Bexdayê ve hatin suçdar kirin, ku alikariyê ji Îranê digrin. Her çend Îran ev îtham qebûl nekirin jî, li gor agahdariyên ku ji herême tî, leşkerên Îranê bi xwe, ji bo ku meqerên "Mucahiddîn-î Xelk" (rêxistina ku li dijî rejîma Teheranê têdikoşe û pêwendiyên xurt bi Iraqê re heye) li Iraqê hilweşîne, ketiye erdê Iraqê bi xwe. Serokên şîyan bi alîkariya telewîzyona Teheranê, yên ku serkeftinên şerê xwe li dijî Bexdayê da xuyakirin, gotin ku kontrola bajarên Necef, Kerbela, Besra, bi deham bajarên din ên biçûktir zêdeyiya herêma-bakûra Iraqê- di destê wan de ye.

Di dema piştî şer de, em bûne şahidê pêwendiyên fereh di navbera muxalefeta Iraqê û tevgera Kurd de. Lê, emê vê pirsê di beşa li ser pirsê Kurd de bigrine destan. Tiştê wekî din heta nuha pêkhatin ev in, ku di bin aleke de şîî, komunist, BAAS-yên pêşberî Saddam, Nasirî û hêzên din ê muxalefeta Iraqê de kom bibin. Rengarengiya dîtîn, îdeolojî û alternatîva pêşeroja "Iraqe-ke Çawa?" di nav hêzên cuda de, bi awayekî gelekî cuda tê girtin. Di roja 22'ê adarê de danezanên ragihandinên cîhanî belavkirin, ku serkirdayetîya muxalefeta Iraqê, ji bo ku bikaribe serokatiya şerê li dijî Saddam bi awakî xurt îdare bike, diçe ser erda Kurdistanê Iraqê.

Piştî derxistina leşkerên Iraqê ji Kuweytê, bi destxistina parçeyê jî xaka bakurî Iraqê ji bal Hêzên hevkar ve danîna çekan, li Rohhilata Navîn trafîka diplomasî, gihîşt e encameke bilind.

Roj tune ye, ji dema rawestana şer heta nuha ku di navbera welatên herême, bi welatên Ewropa û Emerîka re tû pêwendiyên dîplomasî nebin. Di vê germ-bûna jiyana siyasî de, girîngtirîn pirs-pêkanîna çareserîya ji bo problemên Rojhilata Navîn û peydekirina aşî û ewletiyê di herême de ye. Di vî warî de, dest bi planên pratîk jî bû: Her çend di dema şerê Xelîcê de bi hemû hebûna xwe Rêxistina Rizgariya Fîlistînî (PLO) li gel Seddam cih girt, bi her awayî piştgirîya xwe ji bo Seddam da nişandan jî, pirs Fîlistînê hate rojewa siyasî, ji bo çareserîkirinê. Îsrail bi xwe da nişandan ku ji berê ve amadeye ji Golan û Şerîa Rojava derkeve. Qebûl kir ku welatekî Fîlistîn jî, li ser xerîta Rojhilata Navîn peyda bibe, lê dîtina xwe ku PLO wekî rêxistineke terorîst dibîne û bi wê re tû caran rûnanê, carek din diyar kir.

Lê eger, mirov li bûyerên pêkhatî di dema dawî de li Rojhilata Navîn temaş bike, bêguman wê bibîne, ku girîngtirîn û dînamîktirîn pirs li Rojhilata Navîn, pirs Kurd e.

#### XAKA BAŞÛRÎ KURDISTAN DI DESTÊ GELÊ KURD DE YE

Şerê neteweyê Kurd, ji bo bîdestxistina hemû mafên xwe yê netewî, wekî hemû netewên dunyayê, ne ji duh û îro ve ye. Ev 150 sal in piştî ketina mîrîtiya xwe ya dawîn, ji bal Împaratoriya Osmanî ve heta nuha çek bi destan, her şer û têkoşîna xwe didomîne. Carna ji bo demeke kurt serketin, lê paşî dîsa şkestin, bindestî û li ser xaka welatê xwe bê maf... bû jiyana wî, bû jiyana her kurdekî xwedî hîs û xwedî dil... Di vê dîroka dagirtî bi rûpelên şerefa berxwedan û têkoşînê, bi serî netewandina pêşberî her zilm û ne insanetiyê, gelê Kurd gelek dîktator û faşîst naskirin. Di nav wan de, cihê Seddamê Tekrîfî, cihêkî xuya ye.

Seddamê ku xwîna zarokên Qeledîzê, berpirsiyariya şehîdbûna 5000 zarok, jin û pîrên Helepçe, wendakirina 8000 Barzaniyan, ku bi destên wî yê xwînî çêbûn, di axaftina xwe ya televîzyona Bexdayê de, dîsa wusa digot: "Kurdên heja, bi ya çend kesên ku dixwazin we binin leyistikê nekin. Tevgera kurdan her dem bi alîkariya quwetên

derve bûye, vê carê jî wusa ye. Ewana dest datînin ser çekan meqerên me yê ku kes têde tune ye. Çekên xwe deynin! Wekî dî emê serê wan bipelîxînin." Seddam, wekî her car dîsa derew dikirin. Pêşmergeyên qehreman, ên ku bi çalakiyên xwe yê serfiraz, her roj agahdariyên pîroz dîgînin danezanên ragihandinên cihanî, tenê di çalakiyên xwe yê serfiraz li Zaxoyê dan nişandan ku şerê wan şerekî çawa ye. Li gor ajansên dunyayê bi hezaran leşkerên Iraqê destên pêşmergean her wusa bi hezaran, ên ku xwe xelas kirine, reviyane Turkiyê û Îranê. Hukumeta Turkiyê, ev rastî qebûl kir, ku gelek leşkerên Iraqê reviyane û ketine xaka rojhilat û başûrî rojhilata Turkiyê (Bakurê Kurdistan)

Serfiraziyên pêşmergean û daxuyanîkirina wan ku ku Kerkûk di dest wan de ye, dawî bi kamerên telewîzyoneke Japonî, ji bo hemû dunyayê hate nişandan. Pêşmerge bangdikin "Bijî Kurd û Kurdistan", pêşmergeyekî suretê Seddam bi kêrê xiradikir, ji nav bajêr pêşmergean şerê helîkoptere Iraqî dikirin... Bi vî awayî, carek din pêşmergean nişan dida û dunyayê dî didît ku Kerkuk Kurd e û bajarê Kurdistanê ye.

Sulêmanî bû pîroza yekem ku hatiye rizgarkirin, paşî wê Amedî, Xaniqîn, Hewlêr, Zaxo, Dihok û.. Helepçe... Helepçeya şehîd. Nuha şehîdên Helepçe ew pênc hezar û belkî zêdetir dikarîbûn, ewran biqetînin û temaş bikin: Di roja 3 saliya biranîna Helepçe de, ew di destê pêşmergean wan de bû.

Her wusa di peywendiyên dîplomasî de Berey Kurdistanê Iraq li gor agahdariyên hatine, diyar kirin ku ew aktîvîtetê fereh kirine. Di nav vê demê de, agahdariya senzasyonel ji bal Serokkomara Turkiyê Turgut Ozal ve, gava bi rêya Moskovayê bû, ji bo ziyareta resmî bi Gorbaçov re hate belavkirin, Ozal got:

*"Me, pêwendî bi Berey Kurdistanê Iraqê re daniye. Ji bo vê çendê di 8-ê Adarê de, du serokên wan hatin. Yek jê Celal Talabanî û yê din jî nûnerê M. Barzanî, Muhsîn Dizayî bûn. Ewan bi nûnerên me yê wezareta derve, yê leşkerî û parastinê re rûniştin. Me dîtî û hevîyên xwe ji bo wan diyar kirin û wan jî yê xwe gotin. Em*

*Kurd bi hevdu re dijîn, çima wekî bira em hevdu re nejin. Ji nuha û pê de gerek em piştgirîya Kurdan bikin, divê me di dema wê de ev piştgirî da ba nişandan, jenosîda li Helebçe çêdibû."*

Piştî vê bûyerê li Turkiyê, herareta siyasî pir bi jor ket. Hemû partiyên muxalefeta Turkiyê, yê ku di parlamento de beşdar in, weke grubên siyasî nerazîbûna xwe ji karê Ozal re diyar kirin. Li gor dîtina wan kar û barê Ozal, karekî şexsiyê û parastina dewleta Turkiyê dixê xeterê. Her wusa berî çûndina Ozal a Waşingtonê, hemû partiyên siyasî yê parlamentoya Enqerê, bi taybetî jî, kurê Paşê Erdal İnonu û S. Demirel di nav navan de Serokkomarê Turkiyê yê berê Kenan Evren jî daxuyanîkirin ku Ozal nekarê tû tawîzan bide Bush li ser pirs Kurd, Ermenî û Qibrîsê.

Wekî encamê hevdiîtinê bi serkirdayetiya Enqere re ku tû tawîz nedane, di agahdariyên hatin belavkirin de, bi hevpeyvîna bi radyoyoya BBC re û bi hevpeyvîna bi Ajansa Nûçeya Kurdistan ANK re Celal Talabanî nişan kir her du aliyan dîtînin xwe ji hev re gotine. Berey Kurdistan çend daxwazî ji Turkiyê kirine, yê ku Turkan pozîtîv bersîva wan dane, lê li ser gelek pirsan jî ku dîtînin wan ji hev du cudabûn hebûne.

Heta nuha ne diyar e, gelo Berey Kurdistanê Iraqê ya ku hêzên wê yê leşkerî di bin pêşengîya M. Barzanî de, ji %95 xaka Başûrê Kurdistan di destê xwe de digrin, wê bi biryareke çawa, rewşa pirs Kurd bidin diyarkirin, hîn jî ne xuyaye. Kurdistan di bin destên pêşmergean de ye û rojê nêzik dê gelek pirsan li derdora pirs Kurd ronî bikin. Çavên hemû kurdan îro ber bi Başûrê Kurdistan ve ye. Her agahdarî ji rojan ve pîroziyan li gel xwe tene. Em, hemû li hevîya encama herî Pîroz in. li Xabûrê Ala Rengîn ezmanê welatê me xemilandibû, ji bakurê Kurdistanê gelê Kurd pêşmergean xwe yê başûrê bi serfiraziya wan dîtîbûn... Pêşmergean, bi fişekên keleşkofan pîroziya serfiraziya xwe ji birayê xwe yê bakur re nişan dan. Her serkeftî bin pêşmerge û her serkeftî be Neteweyê Kurd.

Loran Cengîn

# MAM HEJAR WEFAT KIR

- Şairê bi navûdeng û welatperwerê kurd, Mam Hejar, şeva 21'ê sibatê li Îranê ji ber nexweşiya dil wefat kir. Mamoste hejar 70 salî bû.
- Mirina Mam Hejar Mukrîyanî, hemû kurdên li welêt û kurdên li dervayê welêt kir nav xemgîniyeke mezin. Li Parîsê Enstîtuya Kurd, li Stockholmê ji Federaşyona Komelên Kurdistanê şîn û civînên biranîna Mam hejar li darxistin.

## MAM HEJAR KÎ YE?

Mamoste Hejar Mikrîyanî (Ebdurrehman Şerefkendî) di hezîrana 1920'î de li bajarê Mahabadê hate dinê. Zaroktîya wî li mizgeft û medresan de li cem meleyên kurd, bi xwendinê derbas dibe. Bi tevî xebatên xweyî edebî, dest bi xebatên rêxistinî jî dike û dibe endamê Komela Jiyani Kurd. Di dema Komara Demokratîk a Mahabadê de, bi çalakane di jiyana edeb û kultura kurd de cî digre. Li bajarê Bokanê li gel Hessen Qizilçî kovara HELALE derdixe û her weha di kovar û rojnamên kurdî ku ji aliyê Komara Kurdistanê derdiketin de nivîsar û şûrên wî belav dibûn. Û di wê demê de Mam Hejar û mamoste Hêmin, bi awakî resmî nasnavê şairê millî yê kurd digrin.

Piştî ku dijmin êrîş dibe ser Komara Mehabadê, Mamoste Hejar ji neçarî derbasî Kurdistanê Başûr dibe û li wir karê nivîsandinê berdewam dike. Lê piştî demekê Mam Hejar tûşî nexweşiya tuberkuloz dibe û ji bo tedawîya xwe diçe sê sal li Lubnanê dimîne. Dûre vedigere Iraqê, lê ji ber tadayên rejîma Paşayetiya Iraqê, nikare li wir bişî, derbasî Sûriyê dibe. Piştî şoreşa 1958'an, dîsa vedigere Iraqê. Wexta Mele Mistefa Barzanî vedigere Kurdistanê, barê jiyana Mam Hejar sivik debe. Çunku welatperwerê mezin Mistefa Barzanî, belavkirin û çapkirina berhemên wî, alîkariyê wî dike.


Di sala 1959'an de Mam Hejar bi dawetî diçe Sovyetê û li wir wekî endamê şerefê ya Yekîtiya Nivîskarên Azerbeycanê tê qebûl kirin. Sala 1960'î ji Sovyetê vedigere Iraqê. Wexta şoreşa Kurdistanê Başûr dest pê dike, Mam Hejar diçe nav şoreşê. Piştî lihevhatina 11 adara 1970'ê, Mam Hejar ji bo serokatiya Yekîtiya Nivîskarên Kurd, tê hilbijartin.

Di sala 1975'an de bi dû têkçûna şoreşê ji ber peymana 1975'an Cezayirê, Mam Hejar jî diçe Îranê û li wir bi cî dibe.

Zimanzanê berz, şairê millî yê Kurd, bê yî dîwana xwe ya bi navê Kurdistan, heta nuha bêtir ji 20 berhemên xwe çapkiriye. Hinek ji berhemên giranbuha yên Mam Hejar ku hatine çapkirin ev in:

Alekok (helbest), Hejar bo Kurdistan (helbest), Xeyyam (werger), Mem û Zîn a Ehmedê Xanî, Şerefname û Dîwana Melayê Cizîrî, Ferhengî Kurdî Farişî, û hwd.

Hezar silav û rêz ji bo Mamoste Hejar!



## HER KURDIM

Be derbederî yan le malî xom  
Le xakî Ereb, le Îran û Rom  
Kok û poşte bim, rût û recal bim  
Koşkim dehqat bê, wêrane mal bim  
Aza û rizgar bim, şadan û xendan  
Yan zincîr le mil, le suçî zîndan  
Sax bim, cihêl bim, bigrim coy suwanan  
Yan zar û nizar le nexoşxanan  
Danîşim le ser textî xwendkarî  
Yan lekolanan bikim hejarî  
Kurd im û le rey Kurd û Kurdistan  
Ser le pênav im, gan le ser destan  
Be kurdî dejîm, be kurdî demrim  
Be kurdî deydem weramî qebirim  
Be kurdî dîsan zînd û debimewa  
Lew dinyaş bo Kurd têhilçimewa.

Hejar

# Gelo zimanê kurdî serbest an qedexe dibe?

## Kel û pel û serbestbûna zimanê kurdî

Wek ku tê zanîn heta niha li Tirkîyê û Kurdistana Bakur hebûna Kurdan nehat qebûl kirin û zimanê kurdî jî qedexe bû. Ji dema Mustafa Kemal ve heta niha nêzî 70 sal in, ku ev politîka nijadperest û paşverû tê domandin. Di vî warî de qanûnên curbe cur hene. Heta îro gelek Kurd bi van qanûnên nijadperest hatine bi dar ve kirin û bi salan di zindanan de êşkence dîtine. Bi taybetî 1983'î de dewleta Tirk bi navê 2932 qanûneke nû derxist û bi vê qanûna ha li malê bi kurdî axaftin jî qedexe kir.

Bi destpêkirina krîza Kuweytê re, Tirkîye jî bi awakî aktîv ket nav qaşa şer. Her kes li ser Rojhilata Navîn û bi taybetî li ser Îraqê planên xwe çêdike. Xweza Tirkîye jî, li gor xwe planan çêdike. Çavê Tirkîyê li geşt û parsê ye. Tirkîye dixwaze jî vî şerê di navbera Amerîka û Îraqê de geştê bigre. Ev jî petrola Kerkûk û Mûsilê ye. Ew, wekî teyrê leşxwir li benda leş e. Leş û belateyê Îraqê. Ka jî wê re çî kel û pel dikeve. Ji ber vê yekê jî, ji xwe re li ser ax û petrola Kurdistanê planan çêdike. Divê ew, xwe li gor daxwaz û standartên Ewropayîyan şan bide. Ji van yek jî doza Kurdan e. Heger jî Kurdistana Îraqê kel û pelek bi dest bike, divê mafê Kurdan qebûl bike. Ew dixwaze li Kurdistana Başûr, jî Tirkmen û Kurdan dewletek federatîv pêk bê û garantorê wê jî, ew bi xwe be. Na, dema ku ev herdu alternatîv jî nebin, li Tirkîyê jî wek berê Kurd tunin.

Ji aliyê ve, dewleta Tirk dixwaze bi saya şer, ordiya xwe ya xirbelos, qet nebe modern bike. Amerîka û dewletên Rojava ew tank, top, balafir û malzemeyê şer yên ku anîne Tirkîyê, piştî şer wek sedeqe bidîne wê û bi paş ve nebin. Wan çekên modern jî bo rojên pêş, li dij Kurdan bi kar binin. Ji aliyê din ve jî, li Kurdistana Bakur roj bi roj hişyarbûn û hestê netewî zêde dibe. Dewleta Tirk, êdî nikare pêş li doza netewî bigre. Dixwaze bi kevîrek du çûkan bikuje: Bi serbestkirina axaftina kurdî, pêş li têkoşîna netewî û demokratîk bigre. Lê, niha encama şer gelek plan sero bin kirin.

Ji bo ronahîkirina vê bûyerê, me wek redaksiyona Berbangê xwest bi çend avûqat û rojnamevanên Kurd re civîneke pêk binin û pirsê gotûbêj bikin. Ji Komela Huqûqnasên Kurd Avûqat Weysî Zeydanloğlu û avûqat İbrahim Güçlü, ji rojanama Armançê Rojnamevan Zinarê Xamo û ji rojnama Kurdistan Pressê jî rojnamevan A. Fevzî beşdarî gotûbêjê bûn. Ji Berbangê jî N. Krîv û Amed Tigrîs. Civîn jî aliyê Amed Tigrîs ve hat amade û îdare kirin. Em, encama civînê li kêlekê pêşkêşî we xwendevanên xwe yên heja dikin.

Berbang

**Berbang:** Hûn hemû bi xêr hatin û ji bo beşdarbûna we, em ji we re gelek spas dikin. Em dixwazin pirsê xwe ya yekem ji avûqatê berêz Weysî Zeydanloğlu bikin. Gelo li Tirkîyê jî kengê ve û kîjan qanûn hebûna Kurdan, xebatên wan yên politîk, ziman û kultura kurdî qedexe dikin? Cezayên zindanî û darayî çiqas in? Heta îro dewleta Tirk bi gelemperî ji van qanûnan kîjan bêtir li dij rêxistinên Kurd bi kar anîye?

**Av. Weysî Zeydanloğlu:** Li Tirkîyê qedexekirina xebatên politîk piştî damezrandina Komara Tirkîyê dest pê kir. Pêre jî ya ziman û edebî dom kir. Di sala 1924-an de qanûna Teşkilata Esasî (anayasa) derxistin. Li gor vê qanûna ha ew kesên ku li Tirkîyê û hemwelatîyên Tirk bin, divê Tirk bûn qebûl kirin. Regez (îrk) û dîn çî dibe bila bibe, ew kes Tirk e. Bi vê qanûna bingehî Kurd hatin înkare kirin. Ev madda ha di qanûnên bingehî yên 1961 û 1982 -an de heye.

Heta serhildana Beytulşebabê û ya Şêx Seîd qanûnên cezayî yên kevin hebûn. Di sala 1926-an de, qanûneke cezayî ya nû derxistin. Ji wir bi şûn de, bi pirani û girani jî bo Kurdan maddeya 125-an bi kar anîn. Cezayê 125-an îdam bû. Di sala 1936-an de jî Tirkan maddeyên 141-142 ji qanûna Îtalyê ya faşîst girtin û van maddan jî li dij Kurdên welatparêz û kesên şoreşger bi kar anîn. Di 1959-an şûn ve, ev qanûn gelek caran hatin guhartin. Lê, di 12 Adara 1971 ê de dîsa bi 141-142-an gelek kes hatin ceza kirin. Lê di 12 Îlonê 1980 î de rewş hat guhartin. Vê carê Kurdan ji maddeyên 125,171,173 û 168-an ceza xwarin.

Di dema Mufetişiya Umûmî (1927-1945) de, bi kurdî axaftin li bajaran hatibû qedexe kirin. Kî bi kurdî biaxîfîyan di navbera 5 û 25 kuruşan de ceza lê dihat birin.

Di sala 1983-an de dewleta Tirk qanûna 2932-an derxist. Ev qanûn jî yên din taybetîtir e. Yên ku me li jor navên wan da, wan xebatên siyasî û yên kulturî qedexe dikin û ceza didin. Lê qanûna 2932-an axatîna zimanê Kurdî jî qedexe dike.



Ferqa vê qanûna ha ev e. Niha li gor qanûna bingehiya Tirkiyê fikir serbest e, lê zimanê kurdî qedexe ye. Bi vî zimanî mirov nikare fikra xwe bêje. Ji vê re jî "demokrasi" û "serbestiya fikir" dibêjin.

Cezayê maddeya 125-an îdam e. Li maddeyên 141-142 gelek caran hatin guhartin, di her guhartinê de cezayên wan giran û zêde kirin. Benda 4-an a 141 ji bo rêxistinê ye û bêtir ji bo Kurdan bi kar tînin. Ji 8 salan dest pê dike heta 15 salan e. Benda 3-an a 142-an ji 5 salan heta 10 salan ceza ye û ji bo propogandayê ye. Ya 168 15 sal ceza ye. Maddeya 171 jî, ji bo wan kesên ku bê çek xebata siyasî dikin bi kar tînin. Cezayê vê maddê jî di navbera 8-15 salan de ye. 173 ê jî koçkirin û sirgun e.

Av. İbrahim Güçlü: Qanûna esasî li her welaî tarîfa sistema dewletê dike. Ev rastiya ji bo dewleta Tirk jî derbas dibe. Qanûna esasî ya Tirkiyê, tarîfa sistema siyasî, aborî,

huqûqî û leşkerî dike. Dewleta Tirk jî, dewleteke nîjadperest û koloniyalîst e. Ji bo vê jî, dema mirov li qanûnên esasî yên Tirkiyê yên 1924, 1960, 1971 û 1982-an binêre, dibîne ku di wan de guhartinên bingehîn nebûne. Ji ber ku Komara Tirkiyê li ser esasê nîjadperestiyê ava bûye. Belê, sistemeke parlementerî anîye, lê her dem parastina yekgirtin û ewlekariya netewî ya Tirk esas girtiye. Li dij pirsra Kurdan û minorîteyên din rawestayê. Di 1959-an de him ji bo propoganda kurdîtiyê û him ji bo organîzekirina Kurdan ceza kêmbû. Ji salek heta sê salan bû. Di 12 ê Adarê de dîtîna, ku cezayên qanûnên heyî kêmbûn. Rabûn piraniya Kurdan bi 141-ê ve ceza kirin û ku ev madde ji organîzekirina komunîzmê ye. Ji ber ku cezayên giran bidin Kurdan, wan bi madda komunîzmê ve girêdan. Mesela ji bo DDKO benda yekem ya 141 bi kar anîn, ku ev jî 8-15 sal ceza ye.

Qanûna partiyên siyasî di sala

1960'î de derketi bû û di 1970'î de hat guhartin. Pirsra ku partiyên siyasî nikarin, xwe li ser bingeha dînî û regezî ava bikin. Ev pirsra, di qanûna partiyên siyasî de, di xala 81-an de hat formule kirin. Çimkî, berî 12 Adarê, partiya Karker ya Tirkiyê (TİP) di kongra xwe ya çaremîn de, ji bo gelê Kurd biryarên girîng girtibûn. Piştî 12 Adarê TIP girêdayî pirsra gelê Kurd, ji aliyê Dageha Esasî ya Bilintirîn hate girtin.

Piştî 1980'î hukîmetê li dij Kurdan bi taybetî qanûnên 125 û 171'ê bi kar anîn. Lê di Qanûna Cezayî de, xala 171-ê bi serê xwe hukmek nîne, girêdayiyê xala 125-an e û maneyek wê heye. Yanî serkaniya xala 171 benda yekê; xala 125-an e. Ji ber ku dewleta Tirk xwe di çavên Rojavayîyan de demokrat nîşan bidin û bêjin, va ye em 141-142 û 163 ji navê rakin. Û ji ber vê yekê jî bi taybetî 171 li dij Kurdan bi kar anîn.

*Berbang: Ez dixwazim pirsra*

*Ismail Beşikçi:*

## Divê Kurd bê îzin biaxifin û binivîsin!

Çend roj berî niha Radyoya Merhaba ku bi tirkî li Swêdê weşan dike, li ser serbestbûna zimanê kurdî bi Ismail Beşikçi re hevpeyvînek kiri bû. Me, ew hevpeyvîn ji tirkî wergêrand kurdî û li jêr pêşkêş dikin.

Radyoya Merhaba: Berêz Dr. İ. Beşikçi, wek tu dizanî, hukîmeta Tirkiyê biryar girt, ku zimanê kurdî serbest bike. Tu dikarî di vî warî de, ji bo me, bi kurtasî dîtina xwe diyar bikî?

İ. Beşikçi: Di krîza Xalîcê de Kurd jî li Rohilata Navîn wek hêzeke sereke derketin navê. Di rewşeke weha de hinek sazgehên navnetewî, hinek dewlet wek Dewletên Yekbûyî yên Amerîka, Ewropa û heta hinek dewletên Erebbî, ji bo Kurdan projeyên curbe cur perpêş dikin.

Di vê rewşa ha de Tirkiyê jî hewl-

dana çareserkirina hinek probleman kir. Bi baweriya min, bi taybetî piştî 1984-an ku li Kurdistan, Kurdîstana Bakur şerê çekdarî dest pê kir, pirsra Kurd girs bû. Di nav gel de herfirêş û destekeke gelek mezin dît. Ev bawerî di nav gel de, ji bo Kurdistanê serbixwe, yekgirtî û demokratîk derdikeve holê. Li hember vê rewşa ha, hukîmeta Tirk hewl da, ew qanûna ku di sala 1983-an de, ji bo qedexekirina axaftina kurdî derxisti bû, ji navê rabike. Bi dîtina min, ew hewldan nikare tû tiştêkî hel bike. Rakirina qanûna 1983-an a ku axaftina zimanê kurdî qedexe kiri bû, tiştêkî çareser nake. Ev çareserkerîneke kevin û paşketî ye. Ji ber ku rakirina vê qanûnê me vedigerîne berî dema 1983-an. Ji xwe berî 1983-an li ser Kurdan û zimanê wan zilm û tadeyeke gelek mezin û giran

hebûn.

Radyoya Merhaba: Gelo di dîroka siyasî de paşvedayîna mafên berê ne gaveke pêşketî ye?

İ. Beşikçi: Ez vê yekê gaveke pêşketî nabînim. Li vê derê, ya herî girînrawêj (tewir) û şêla Kurdan e. Ango divê Kurd bi kurdî biaxifin û binivîsin. Ji bo vê yekê pêwîst nîne, ku îzin ji hukîmetê bigrin; Ji ber ku ew qanûna ha, bi xwe xeyrî meşrû ye. Ev li dij mafên mirovî, prensîbên navnetewî û prensîbên însanî ye. Ji ber vê yekê jî ji hukîmetê îzin girtin yan jî, ji bo qanûneke nû ji parlamentoyê hewldana derxistina qanûnekê nû, tiştêkî rast nîne. Ango divê Kurd bi kurdî biaxifin û binivîsin. Xweza dê hinek rîskên wê jî hebin, divê wan rîskan jî bigrin ber çav.

diduyan ji rojnamevanê rojname Armancê Zinarê Xamo bipirsim. Ma dewleta Tirk bikaranîna qanûnên xwe yên nijadperest û paşverû ferq dixê navbera xebatên politîk, kulturî û yên edebî?

**Zinarê Xamo (Armanc):** Li gor îcraeta dewleta Tirk heta îro, wan tû ferq ne xistine navberê û heta di vî warî de qanûnên xwe yên hene jî, dane bin lingan. Çi xebatên siyasî û çi xebatên edebî be, hemû bi fedakarî bûne. Di tarîxa Cumhuriyeta Tirkiyê de qet ferq nexistine navbera xebatên siyasî û edebî. Her dema tehlûke dîtine, ceza û heps dane.

**Av. Weysî Zeydanlıoğlu:** Dewleta Tirk di pratîkê de nikare ferq bixe navberê; ji ber ku xebatên kulturî û edebî nîşanên hebûna Kurdan in. Ji ber vê yekê xebatên edebî ji bo dewleta Tirk dibe xebatên siyasî. Mesela sêlikeke (plaqeke) muzîkê hatibû girtin. Mehkemê qerar da, ku ev îşareta Kurdan e û ji ber vê yekê ceza dane xwediyê wê.


**Av. İbrahim Güçlü:** Lê, piçek be jî, ferqên şiklî hene. Mesela 141-142 ji bo propaganda û rêxistinî ne. Berî 12 ê İlonê, cezayên her du xalên Qanûna Cezayî jî, ji salek heta 3 salan bûn. Lê, cezê xala 141 - ji bo organîzekerîna kurdîtiyê ye - cezayê giran bû; cezayê xala 142, - ji bo propaganda kurdayetiyê ye - cezayê sivik bû. Lê, piştî 12-ê İlonê, rejîma dîktator ev cezaya kêmtirîn û zêde kirin. 141 cezayê wê 8-15 sal in û 142 jî 5-10 sal in. 171 Ji bo karê kulturî û edebî nîne. Yanê di navbera herdu curan de nermiyek heye.

**Berbang:** Kek İbrahim, wek tê zanîn qedexe, ceza û tewanbarkirina bi zimanê xwe axaftin li cîhanê bi tenê li Tirkiyê heye û maye. Ev jî bi tenê li ser zimanê kurdî ye. Gelo ev qedexe û cezakerîna zimanê kurdî, di hêla huqûqî de direkt mudaxela jiyana neteweyê Kurd e, an na?

## Armanc

Ser di navbera millet u hezen metingehkar de derket

Yedat Xedid di meclisê de bûnê



**Av. İbrahim Güçlü:** Belê direkt mudaxela jiyana neteweyê Kurd e. Ez naxwazim dût û dirêj li ser rawestim, lê rastiyeke îlmî heye, ku di jiyana gel û netewan de, di pêşveçûn û paşvemayîna gel û netewan de, ziman roleke gelek girîng dileyze. Bê guman ev rastiya ji bo neteweyê Kurd jî derbas dibe. Qedexekirina zimanê kurdî ji bo ji navê rakirina gelê Kurd e. Ev li pêşketina gelê Kurd tesîr dike. Şertên jîyan û pêşveçûnê li pêş gelê Kurd tê girtin. Ev jî raste rast mudaxela jiyana Neteweyê Kurd e. Dema ku mirov jiyana neteweyê Kurd analîz bike, rast e rast dibîne, ku di şexsiyet dîtina gelê Kurd de, girêdayî tesîra milletên serdest û koloniyalîst, cot standartî çêbûye. Ev bi serê xwe trajediyek nîne, çi ye?

**Av. Weysî Zeydanlıoğlu:** Belê, mudaxeleyeke bi tesîr e. Mirov ne bi tenê ye. Nikare bi serê xwe bijî. Têkilî lazim e. Bê ziman mirov nikare têkilî bi yên din re deyne. Ziman hacetê mezîn û girîng e. Yekî gundî here bajêr, jê re ziman lazim e, ku bi yên din re têkilî deyne. Nikare tiştê bikire û bistîne. Nikare jiyana xwe bidomîne. Ev direkt mudaxela jiyana gelê Kurd e.

**Zinarê Xamo:** Ez ne huqûknas im, lê tiştê heye, ku ji derî mafê huqûqî, mafekî mirovî ye. Ev qedexekirin li dijî hebûna însan e. Dewletê zimanê miletekî jê kirîye. Wek

bulbulê ku tu nehêlî bixwîne. Ma ji vê yekê re jî huqûq tê gotin; dê û law li ber pencereyên hefsê li hevdu dinêrin û nikarin bi hevdu re qise bikin. Dê mecbûre bi lawê xwe yê girtî re bi tirkî qise bike, lê dayik bi tirkî nizane û kurdî jî qedexe ye. Bi çavan bi hevdu re dipeyîvin.

**A. Fevzî (Kurdistan Press):** Wek di pirsê de jî hatiye nivîsandin, qedexekirina ziman di dinyayê de, ji derê hukimeta Tirk nayê bira tû kesî.

**Berbang:** Çendek berî niha bi direktîva Turgut Özal, hukimeta Tirk hewlida, ku qanûna 2932-ana ya ku li Kurdistana Bakur û Tirkiyê axaftina bi zimanê kurdî qedexe kiri bû, ji navê rabike û zimanê kurdî serbest bike. Li gor we, ev serbestbûn tê çi maneyî?

**A. Fevzî (Kurdistan Press):** Li Tirkiyê destpêkirina li ser zimanê kurdî, du aliyên wî yên girîng hene.

Yek îdeolojî û siyasî ye. Ya duyem huqûqî ye. Bi van herduyan girêdayî jî aliyê pratîk e.

Ji aliyê îdeolojî û siyasî ve destpêkirina munaqêşê li ser serbestkirina zimanê kurdî, bi xwe gaveke pir girîng e. Ji ber ku îdeolojiya resmî hebûna Kurd înkâr dike. Bi vê munaqêşê bingehê îdeolojiya resmî dileqe. Ji ber ku ev munaqêşê bi xwe înkara politîka û îdeolojiya resmî ye. Tesîrên wê yên siyasî jî hene. Ji bo tevger, weşan û ronakbîrên Kurd aliyê girîng ev e.

Aliyê duyemîn guhartina "qanûna derheqê zimanê tirkî de" ye. Ev musfe-de bi vî halê xwe formeke huqûqî ji bo serbestkirina zimanê kurdî nayîne.

Aliyê pratîk jî, ji xwe xelk bi kurdî dipeyîve. Stranbêj bi kurdî distrin. Hin caran hindik be jî, di hin kovan de bi kurdî nivîs derdikevin. Ango di pratîkê de ev qedexebûn nemaye. Lê, ev gav gaveke girîng e, îdeolojiya resmî dihejîne, dileqîne...

**Av. İbrahim Güçlü:** Piştî avakirina Komara Tirkiyê, politîka wê

înkarkirina Kurdan e. Ji bo vê yekê gelek teorîyên nû çêkirin. Wek Têzên Tarîx, Ziman û Ro .... Dema Kurd li dij van tez û teorîyên pûç û nîjadperest derketin, hatin ceza kirin. Iro îtirafkirina zimanê kurdî hebûna Kurdan dide qebûl kirin. Tê wê manê ku politîka resmî êdî îflas kiriye. Ji xwe di jîyana civakî de îflas kiribû. Êdî pîrsa Kurd hatiye merheleke nû. Heta niha digotin zimanê kurdî tune, lê niha serokên dewleta Tirk bi xwe dibêjin Kurd û zimanê wan hene. Di vê manê de gaveke pêşketî ye. Mesela 1977-an de, dawayekê KOMALê hebû û ez jî wek avûqat beşdarî wê bûm. Di vê dawê de mehkema bilind biryar da ku "bi zimanê kurdî nivîsandin Tirkîyê perçe nake. Lê, naveroka nivîsaran girîng e." Dîsan di sala 1986-an de Dadgeha Ewlekariya Ankarê, ji bo Edîp Serwet Dewrimci biryar dabû ku "bi kurdî axaftin naye maneya propaganda kurdîtiyê." Ev biryara, ji aliyê daîra 9 a Yargitayê ve jî hate testîq kirin. Lê, van biryaran tesîrên gelek kêr kirin. Bes, ew kesên bi van pîrsan re têkiliyên wan hene, heta bes, huqûqzanan dizanî. Feqet demeka ku serokkomarê Tirkîyê, ji Kurdan û 12 milyon Kurdan bahs kir, tesîreke gelemperî û mezintir kir. Ew şoweniya ku di nav gelê Tirk de hatibû avakirin şikestinek xwar. Wek tê zanîn ev qanûna nû ya ku dixwaze di derheqê zimanê kurdî de derbixin ji 9 xalan pêk tê. Li gor vê qanûne:

- Zimanê resmî dê dîsan bi tirkî be.
- Çapemenî dê bi tenê bi tirkî be. Kesê ku bi kurdî nameyek jî binivîse, heger karê wî/wê hebe, ji kar tê avêtin û ji 3 mehan heta 2 salan tê cezakirin.
- Dê zimanê dibistan bi tenê bi tirkî be.
- Kurdî wek devokek (lehceyek) tê qebûl kirin.
- Bi tenê axaftin û muzîka kurdî serbest dibe.

.....

Mirov baş dibîne, ku ev qanûna nû, wek naverok tişteki gelek li paş e. Wek ku profesorekî Tirk dibêje "ma qanûna zimên dibe?"

**Av. Weysî Zeydanlıoğlu:** Serbestbûn tê çi maneyî? Bi tenê qanûna 2932-an naye tû maneyî. Mecbûr in, ku qanûnên nû derxin. Niha guhartin ev e, ku axaftinê serbest dîkin. Ji xwe her kes di mala xwe de dipeyîve. Ev serbestiya han naye tû maneyek jî. Pêşnava qanûna nû hîn baş ne kîvş e. Di beyanên ANAP û ronakbîrên Tirk de diyar e, ku dewleta Tirk bi sazgehên xwe ve ne hazir in, ku guhartinên bingehîn çêbikin. Lê, dema mirov li axaftina Özal dinêre tişek heye û tê ortê. Wî, wek serokkomar got ku "li Tirkîyê Kurd hene û hejmara wan 12 milyon in." Bi dîtina min ev gotin ji guhartina qanûnê girîngtir e. Wek ku hevalê Kurdistan Press jî got " ev munaqeseyên ku li Tirkîyê çêdibin bingehê kemalîzmê dihejîne." Kemalîzmê di dema Özal de derbe xwar. Sê prensîbên kemalîzmê hebû: Yek nîjadperestî, ya diduyan antî-komunîzm û ya sisêyan jî laîkîzm bû. Ev hersê prensîbên kemalîzmê niha li Tirkîyê qul bûne. Qul bûne wek bêjîngê, wek seradê! Binêrin niha li Tirkîyê hejmara Kurdan tê munaqese kirin. Belê, qanûna 2932-an bi tenê, bi serê xwe, qanûneke paşverû ye. Ev qanûn derkeve jî êdî rezil bû, kadûk bû.

Li gor çapemeniya Tirkîyê, dê hinek qanûnên din jî bîn guhartin. Lê baş ne diyar e, ka dê ew guhartin çi bin. Berî her tiştî, divê qanûna bingehîn ya 1982-an ji binî ve ji navê bê rakirin. Qanûna bingehîn faşîst e. 20-30 maddeyên faşîst û nîjadperest tê de hene. Kurdî serbest bikin jî, dîsan li gor van qanûnan perwerde bi kurdî nabe. Heta maddeyên qanûna bingehîn yê 26,28,141 û 142 û hinek maddeyên qanûna cezayê neyêne guhartin, zimanê kurdî serbest nabe. Pêwîst e, ku çapemeniya kurdî, weşanên kurdî serbest bibin. Radyo TV. bi kurdî weşan bikin. Wê çaxê mirov dikare bêje zimanê kurdî serbest e.

**Zinarê Xamo (Armanç):** Bi bawerîya min, rakirina qanûna 2932-an qezenceke girîng bi xwe re nîne jî, cardin girîng e. Bê guman di vî warî de gelek hesabên dewleta Tirk hene. Lê rakirna vê qanûnê wê gelek tiştan bi xwe re



bîne. Ji aliyê huqûqî ve, ew kesên ku bi kurdî distrên, qedexa li ser stranên wan radibe. Filim û video serbest dibin. Divê em qebûl bikin, millet ne qehreman e, ew, cezayên hefsê nagirin ber çavan. Di vê çarçovê de be jî, wê gelek kaset, stran filim derkevin navê. Ev jî wê ji pêşketina kultur û edebiyata kurdî re bibin çavkanî. Berê ev ne mumkun bû. Di warê îdeolojîk de jî terk li diwarê kemalîzmê dikeve. Wan ev biryar bi xêra bavê xwe negirtine. Bi têkoşîna Kurdan hatiye stendin. Tevegera Kurd divê tecrûbeyên nû jê derbixe. Di pratîkê de îdeolojiya kemalist ketiye buhranekê. Divê em zêdetir bi ser de herin. Qulkirina çarçovê bi me ve girêdayî ye. Û muhîm millet bi çavên xwe dibîne, ku me ji dewletê tişteke girtî ye. Ev ji aliyê sîyasî û moral ve gelek baş e. Netîceyêke muhîm e. Mirovên normal jî êdî wê xwedî lê derkevin.

**Av. İbrahim Güçlü:** Di pratîkê de girêdayî muxalefeta civakî, pêşveçûna sîyasî û guhartinên li cîhanê, 141,142 û 163 ji navê hatîye rakirin û niha dixwazin ji aliyê huqûqî ve jî wan ji navê rabikin. Bi salan e, li dij wan muhalefet hebûn. Ji ber vê yekê niha dixwazin ji aliyê Kurdan ve jî hinek guhartin çêbikin. Dewlet mecbûr maye û van qanûnan diguhêre. Ji bo guhartinan divê em Kurd jî, di xal û qanûnên kongkret de, xebatê geş bikin. Ji bo vê, jî, pêwîst e, ku di

huqûqa Tirkan de, ew qanûnên ku gelek eşkere li dijî Kurd û kurdayetiyê ne, bi riya huqûqzane û sîyasetvanên Kurd ve bîn tespît kirin, li dijî wan muxalefet bê kirin û guhartin bîn xwastin. Eynî tişt, ji bo huqûq û peymanên navnetewî jî pêwîst e. Ji lewre, di huqûq û peymanên navnetewî de, gelek tişt hene, ku Kurd wek neteweyekî, dikarin jê îstîfade bikin.

**A. Fevzî (Kurdistan Press):** Sebebên daxilî û xaricî tesîreke mezin lê dikin, ku Tirkîye xwe biguhêre. Li gel wê, divê em bibînin, ku Özal bi xwe Tirkîyê diguhêre. Ew guhartin di nav çarçova sîstema dewleta Tirk de, bi xwe guhartinên bingehîn in. Divê em munaqeseyên li ser madda 2932-an wisa binêrin.

Cîh tune ye, ku mirov van sebebên daxilî û xaricî li vir rêz bike. Lê Özal, di van guhartinan de rolekê mezin dileyze. Divê mirov wê bibîne. Ev ji demokratbûna Özal nayê. Lê, Özal sîyasetvanekî pragmatîst e. Bi girêdayiyê tesîrên daxilî û xaricî di xwaze tradîsyona dewleta Tirk biguhêre. Ji bo wê, divê ew guhartinên ku li ser maddeyên 141, 142, 163 û ya zimanê kurdî tê munaqesê kirin bi vî çavî binêrin.

**Barbang: Heval Zinar, Gelo hukimeta Tirk çima dixwaze di dema krîza Kuweytê de qanûna 2932-an ji navê rabike? Hin qasî 2-3 mehan berî niha serokwezîrê Tirkîyê Y. Akbulut digot ku "li Tirkîyê bi tenê Tirk hene. Li Rojhilata Tirkîyê (qest Kurdistan e) jî pewîst e, her kes bibe Tirk." Ma çi lê hat ku Tirkên 2-3 meh berî niha, îro bûn Kurd?**

**Zinarê Xamo (Armanç):** Munaqesê qanûna 2932-an berî destpêka şer bû. Ev jî tiştekî nîşan dide. Tirkîyê dixwest bi awakî aktîv bikeve nav şer. Pêşî texmînkirina şer zehmet bû. Ji ber vê yekê li ser maseya sîyasî ji xwe re şertên rehetiyê çêbibe, ev biryar girt.

Bêguman rakirina bûyera qanûna 2932-an nayê wê maneyê ku dewleta Tirk gavek ber bi demokrasîyê avêtîye,

an davêje. Yan jî dixwazin pirsê Kurd di nav dewleta Tirk de be jî hel bikin, na! Du sebeb hene: Yek têkoşîna gelê Kurd e. Wê, dewleta Tirk mecbûr kirîye, ku rê li ber hinek tiştên din bigrin. Rê li muhalefetê bigre. Îro mesela Kurdî ji nav çend teleban derketîye û bûye mesela gel. Ev ji bona dewletê tehlîke ye. PKK ji sala 1984-an vir de, li dij dewletê cek teqandîye û zerar daye wê. Lê, serhildanên Nisêbîn û Cizîrê ji wê bêtir dewletê tirsand. Hemû partiyên dewletê gotin "dewlet ji dest çû." Li çareserkerîne gerîyan. Ev jî wek şekerek bavêjin devê Kurdan. Menavrayek da dewleta Tirk. Divê em vê sextekariya wan eşkera bikin. Ji aliyê din ve, li dinyayê guhartinên mezin çêbûn. Wek xewn sîstema sosyalîst belav bû. Di van sîsteman de têkoşîna mili derket rastê. Bayê azadiyê hat. Tesîra wê li Tirkîyê jî çêbû. Tirkîye dixwaze bikeve nav organîzasyon û sazgehên Ewropî. Lê bi van qanûnên barbar nikare bikeve nav wan. Ji aliyê din ve muxalefeteke Kurd li Ewropa heye. Hinek dewletên cîran jî dixwazin li dij Tirkîyê bixebitin. Tirkîye ji ber vê yekê dixwaze muxalefetê sist bike.

**Av. Weysî Zeydanlıoğlu:** Çend aliyên wê pirsê hene. Yek jê têkoşîna Kurdan e, ku heta îro dom dîke. Ev têkoşîn li bajar û gund îro gehêştîye merheleke nû û mezin. Ev tiştekî gelek girîng e. Dewleta Tirk li dij têkoşîna Kurd wek dema şerê Ş. Seîd, Dersim, Aratê ûwd., êdê nikare bi awakî vekirî qetlîaman pêk bîne. Îro di hundir de muxalefet heye. Li der Ewropa heye. Ji aliyê din de, şertên dinyayê hatine guhartin. Di derheqê mafê mirovî û yê mînorîtetan de rêxistina Parastin û Hekariya Ewropê (PHE) biryar girt û Tirkîyê jî, li bin wê biryarê îmza kir.

Lê, ev pirs çima di dema krîza Kuweytê de hat navê? Divê mirov ji bîr neke, ku şer li Îraqê bû. Piştî şer pirsên Rojhilata Navîn dê bihatan rojevê. Ev direkt bi pirsê Kurd ve jî girêdayî ye. Îro li Rojhilata Navîn pirsên sereke, pirsên Filistin û yên Kurdan in. Tirk jî, dixwazin di Rojhi-

lata Navîn de politîkake aktîv bajon û roleke aktîv bilîzin. Pirsê Kurdan pêş li politîk û xebata wan digre. Ji ber vê yekê jî, ew dixwazin di politîka xwe de hinek guhartin çêbikin û vê pirsê di dema krîza Kuweytê de jî anîn rojevê.

**A. Fevzî (Kurdistan Press):** Mirov sedî sed nîzane çima di dema krîzê de wê qanûnê dixwazin rakin. Ji ber ku hinek pêwendiyên Tirkîyê yên sîyasî li gel DYA (Dewletên Yekbûyên Amerika) û dewletên din hene; wekî Kurd konkret pêwendiyên me tune ne, ku em zanibin ew çi dikin û çi difikirin. Lê, krîza Kuweytê nebûya jî, dê pirsê Kurd biketa rojeva Tirkîyê, ji ber wan sedemên ku Kek Weysî û Kek Zinar rêz kirin. Lê, piçekî texîr kirin, dîsan hat rojevê. Mirov dikare bêje sedem rewşa Rojhilata Navîn e. Bi taybetî rewşa Îraqê û Kurdistanê Îraqê. paşê şer bû sebebê ku Özal roleke aktîv bileyîze. Tirkîye bi qebûlkirina hebûna Kurdan hesab dîke, ku piştî şer bikaribe li ser pirsê kurdî jî tewr deyne. Tirkîye bi politîka xwe ya ku hebûna Kurdan înkâr dîke, biketa nav pirsên Rojhilata Navîn û pirsê kurdî wê jê re reaksiyon çêbiban û tûşî astengên sîyasî biban.

Ya duyemîn senaryoyeke din hebû, ez wê baş nizanîm çi ye, lê qaşo Tirkîye dixwaze bi şikleki federalî Kurdistanê Îraqê jî bixe bin kontrola xwe.

Bi kurtahî krîza Kuweytê rolek leyîst û di vê demê de, wê bînin rojevê. Dê normal ji xwe pirsê kurdî bihata rojevê. Ji ber ku ew amadeyî hebûn...

**Av. İbrahim Güçlü:** Dema mirov li tarîxa Komara Tirkîyê dinêre, Özal yek ji wan serokkomarê rasyonel xuya dîke. Li gor bawerîya min di rastiya Tirkîyê û rastiya cîhanê de, Özal xwedî însiyatîv e. Ji lewre, dizane, ku li hundirê Tirkîyê çi pirsên esasî hene, ew pirs çawan dibin pingara pêşveçûnê; dîsan guhartinên cîhanê baş taqîp dîke û dibîne, ku çi tesîrê li ser Tirkîyê dikin. Özal dixwaze Tirkîyê ji aliyê aborî ve, bi riya liberalî derxe rastê. Li pêş wê jî pirsê gelê Kurd heye. Berî wê, bi demekî wê yekê xwe

dîyar kir. Yekîtiya Bazara Ewropê û DYA di pîrsa Kurd de, zor dide Tirkîyê. Him girêdayî zora van dewletan û him jî girêdayî rastiya Tirkîye Özal pîrsa Kurd bi riya M. Alî Birand û hinek rojnamevanên din bi zanabûn da munaqêşe kirin. Di pîrsa Kurd de gav avêtin jî, çarçoveke demokratîk pêwîst dibîne. Rasyonaliya Özal û avabûna dewletê li dij hev bûn. Özal li derê ANAPê jî hinek qadroyên din çêkirine. Tirkîyê di civîna Parisê de belgeyek îmza kir. Ev îmzakirina vê belgeyê, ji bo mînortetan girîng e. Yıldırım Akbulut li wir hazir bû, lê însiyatîv di destê Özal de bû. Krîza Kuweytê nebûya jî, dê dîsan ev biryara rakirina qanûna 2932-an pîrsên din yê girêdayî gelê Kurd wê bihata rojevê. Wek A. Fevzî got nîne. Özal, sedemên guhartinên dawiyê, gelek vekirî, him di grûba ANAPê de û hem jî gelek vekirî di rojnameyan de dîyar kir. Özal bi xwe got: "Li Rojhilata Navîn guhartin hene. Pêwîst e, ku em di van guhartinan de xwediyê însiyatîv bin. Ji bo vê yekê jî, divê em mesela Kurd bînin rojevê. Di çareserkirina pîrsa Kurd de pêwîst e, ku em gav bavêjin. Dema ku em gav navêjin, ew dewlet û hêzên ku di pîrsa Rojhilata Navîn de teref in, wê ji me re bibêjin ku; "berî her tiştî divê hûn li hundirê welatê xwe, pîrsa Kurdan çareser bikin, piştî wê biaxifin." Wê demê di nav ANAPê de gelek kes li dij derketin. Firsenda krîza Kuweytê, di progrma Özal de, ne bi tenê qanûna 2932-an e. Wî hîn dom kir û got ku; "em ji Kurdan re bibin hamî." Lê, rast e, serokwezîrê Tirkîyê Y. Akbulut di wê demê de digot; "Kurd tunin." Di nav ANAPê de muxalefet heye. Li dij wan dertên. Y. Akbulut komediya polîtîka Tirkîyê ye. Ev rastî hemû demokratbûna Özal dîyar nake, rasyonalbûyîna wî dîyar dike. Ji lewre, ji bo mirovên dinê nasbike û guhartinan taqîb bike, û ji bo pêşketina welatê xwe, ji bo berjewendîya xwe hereket bike, demokratbûn jî gelek hewce ye. Rastiya Tirkîyê ye. Encama têkoşînê ye. Demirel, Ecevît û yê din li paş man. Di destpêkê de, ji axaftinên Demirel her kesî fehm dikir ku ew ê ji Özal pêştir pêşniyaran

bike. Lê di dawiyê de, polîtîka resmî ya dewletê parast. Ew parastina jî, di bin perdê Kurd ne hindikayî ne û piranî de ne kir. Ecevît xirabtir kir, mirov dikare bibêje ku tam bi mentelîta kemalist, cunta leşkerî dawet kir û Özal gelek xeter û welatcudakar elan kir.

**Zinarê Xamo (Armanç):** Heval İbrahim got, ku "Özal ji hemû serokkomarên Tirkîyê yê berî xwe rasyonalistir e." Ez bi xwe ne bi wê baweriyê re me. Bi bawerîya min, berî her tiştî, êdî ew nikarin gelê Kurd wek berê îdare bikin. Ya duduyan, gelê Kurd bi xwe jî êdî naxwaze ji hemû mafên xwe yê netewî bêpar bijî. Nuxta sisiyan jî, li dinyayê gelek guherandin çêbûne, dinya êdî ne dinyaya berê ye. Di dema serokkomarên berî Özal de, ev tişt tunebûn.

**Berbangs: Serokkomarê Tirkîyê T. Özal dibêje ku; "zimanê kurdî bi xwe ne ziman e. Kurd bi xwe bi tirkî dinivîstin û civînên xwe bi tirkî çêdikin." Ez dixwazim vê pîrsa han ji Kek İbrahim bipirsim. Gelo hûn ji vê gotina T. Özal re çi bersiv didin?**

**Av. İbrahim Güçlü:** Lê, ez baş pê nizamim, bi rastî Özal ev gotin gotiye. Çinkî dema ku mirovek bibêje, ku Kurd 12 milyon in, ew kesa baş dizane, ku zimanê 12 milyonî jî heye. Li gor min, ev gotin di nav xwe de, nakokîyeke dîyar dike. Ew gunehê xwe dikin stuyê me. Wan zimanê me qedexe kiriye. Lê, rastiyek jî heye, ku ew jî kêmasî û eyba me ye, ku em bi xwe bi kurdî nanivîsin. Ronakbîr û siyasethanên me di pîrsê de gelek tembelî dikin. Pêwîst e, ku em serokkomarê Tirkîyê derewçin derînin. Lê xebera wî tune ye, ku zimanê kurdî yê nivîsê çiqas pêş ketiye.

**A. Fevzî (Kurdistan Press):** Madem zimanê kurdî ne ziman e; bi rastî bila zimanê kurdî serbest bihêlin. Em dê Kurdistan Pressê li Tirkîyê derxin... Bila kovar û rojnameyên kurdî li Tirkîyê derkevin û Tirk û Kurd

em tev de binêrin ka zimanê kurdî ziman e, an na!

**Av. Weysî Zeydanlıoğlu:** Zimanê kurdî ziman e, an ne ziman e, wek soran dibêjin ev qîseyeke gelek qor e. Em 30 milyon in. Vê yekê Özal jî baş dizane. Polîtîkayeke Tirk a qedîm heye: Tirk her tiştî talan û wêran dikin. Wek 70 sal in ku hebûna ser û binerd a Kurdistanê talan dikin û niha jî dibêjin "li herêma wan tişt tune. Ma em çima avayî û fabrîkan çêbikin. mesrefa xwe dernaxe." Dîsan 70 sal in ku kurdî qedexe kirine. Heta ne bi tenê zimanê nivîdandinê, yê axaftinê jî. Û niha jî dibêjin "ma zimanê wan ê nivîsê tune." Ev bû wek mîsala ku gundê ku kevîran girêdidin û kûçikên xwe berdidin. Bila serbest bikin em dê ji xwe re bibînin, ziman e, an na. Ev munaqêşa me ya bi kurdî, di bîngehê xwe de bersiva wan e.

**Zinarê Xamo (Armanç):** Bi rastî jî van gotinên Özal geyrî ciddî ne. Özal bi xwe got 12 milyon Kurd hene. Heger 12 milyon Kurd hebin, dibê zimanê wan jî hebe. Özal çi dibêje bira bibêje, lê bi rastî şoreşgerên Kurd di vî warî de îmtîhaneke baş nedane. Li ser navê înternasyonalîzmê me roleke negatîv list. Me giringî da ser Sovyet, Çîn û Arnawidê, bi qasî fêrbûna tarîxa wan, me giringî neda fêrbûn û pêşxistina zimanê xwe. Lê, li gel vê jî, bê guman îro tiştê heye jî cardin mîrat û keda me ye. Hîn jî gelek serok û qadroyên siyasî vê biçûkdîtina dijmin ciddî nagirin. Hin partî hene, ku hîn programên wan bi kurdî tune ne. Em gelek, kongre û civînên xwe hîn bi tirkî dikin. Kovarên xwe yê merkezî bi tirkî dinivîsin. Heta Abdullah Öcalan got "ez bi tirkî difikirim û bi tirkî dîtînin xwe rehetir tînim zimên."

Divê ji îro û pê ve Kurd yek-nemeyekê jî ji malên xwe re bi tirkî nenivîsin, divê her kes bi kurdî binivîse. Kongre û civînên xwe bi kurdî çêbikin. Di vî warî de li Swêdê pêşketineke mezin heye. Ronakbîrên

Kurd li Swêdê gelek bi pêş ketine. Lê, li Almanya 15 Armanc tên firotin. Li wir her tişt bi Tirkî ye.

**Berbang:** *Dîsan T. Özal dibêje ku; "divê em giraniya xwe bidin ser weşanên TV ji ber ku TV tesîrekê mezin li zimanê kurdî dike û asîmilasyonê zûtir pêk tîne." Gelo ev rast e? Heger ev rast e, divê Kurd li hember vê aparata asîmilasyonê tewr û tedbîreke çawan bigirin?*

**Av. İbrahim Güçlü:** Rast e, TV tesîrekê gelek mezin li ser gel dike. Ji ber ku TV tesîrekî negatîv dide, asîmilasyonê pêş dixê. Ma mirov wê boykot bike? Lê, ev ne realist e. Mirov nikare vê yekê pêk bîne û rê lê bigre. Çapemeniya me ya perçe perçe jî nikare pêş lê bigre an rê lê teng bike. Divê em çapemeniyên girsî û giştî pêk bînin. Li welêt jî hinek îmkân çêdibin: Ev jî Muzîk e. Divê em carek ji rewşa perçebûnê derbikevin. Mirov li ser vê yekê baş bifikire. Heger em bikaribin çapemeniya kurdî li welêt û derveyê welêt pêk bînin, wê gaveke pêşketî û baş be. Çapemeniyeke ji bo her kesî. Çapkirina pirtûkan belkî li dij vê aparata asîmilasyonê heta derecek bibe asteng.

**A. Fevzî (Kurdistan Press):** Tirkan di riya TV de asîmilasyonê gelek li pêş xistine. Tedbîra bingehîn ew e, ku Kurd di her warê jîyanê de zimanê xwe bi kar bînin, biparêzin. Bikaribin bi her awayî muhaweleyê bikin û weşanên kurdî derxin. Bila dewlemendên Kurd kanaleke TV vekin. Hemû sedemên din li aliyekî, heger Tirkîye bibe endamê Civata Ewropa, divê-nevê dê zimanê kurdî serbest bikin. Divê em Kurd jî vê rojê re amade bin. Divê Kurdistan Press û weşanên din yê kurdî bi plan û programeke rêk û pêk amade bibin, ku sibê li welêt jîyana xwe bi awayekî profesyonelî bidomînin.

**Av. Weysî Zeydanlıoğlu:** TV xetereyeke pir mezin e. TV bi xwe hacetek e. Lê, ew hacet ji aliyê Kurdan

ve jî bê bi kar anîn. Madem ku 12 milyon Kurd hene, Radyo TV heqê Kurdan e. Divê ji wan bê stendin. Hem jî bi têkoşîn bêt stendin. Teknolojî ne di înhîsara dewleta Tirk de ye. Divê Kurd jî wê bi kar bînin. Ev, girêdayiyê îmkân û quweta Kurdan e. Ev bi hêzbûn û yekbûna Kurdan ve girêdayî ye. Bi perçe û belavbûna Kurdan ev yek nabe. Divê bi quweteke mezin li ser meselê bê sekinandin. Ev li ser qebîliyet û feraseta Kurdan dimîne.

**Zinarê Xamo (Armanç):** Yên ku TV îcad kirin qet bir nedikirin ku wê TV Kurdan asîmîle bike. Îro TV ji bo Kurdan roleke negatîv dilîze. Em nikarin wê îmha bikin. TV, bû sebebê jibîrkirina çîrokan, stranan, şevbuhêrkan ûhw... Ew xizmeta asîmilasyonê dike. Ev rast e. Em çî bikin? Xurtkirina zanabûn û şiyarbûna netewî gelek girîng e. Ev yek dikare pêşiyê li asîmilasyonê bi hêsayî bigre. Hin tişt hene em jî dikarin fêde jê bibînin. Kurdan heta niha ji bo tiştên gelek biçûk xwe dane kuştin. Divê em ji bo TV jî bimeşin. Bila ji bo vê yekê jî dijmin were ser me. Dê gelek baş bibe. Em ji bo van gavên biçûk jî bixebitin.

**Berbang:** *Ez dixwazim pirsra me ya dawî, berî ji Kek İbrahim û paşê jî, ji hevalên din bipirsim. Gelo bi tenê serbestbûna zimanê kurdî gavekê pêşketî ye an na? Divê rêxistin û kesên Kurd piştigiriya vê gavê bikin, an li dij derbikevin?*

**Av. İbrahim Güçlü:** Serbestbûna zimanê kurdî gavek geleke pêş e. Ev ji bo mirovên normal zanabûn û şiyarbûn tîne. Ber li xwendinê jî vedike. Xwendin û nivîsandin, şiyarbûna netewî geş dike. Dibe wek laş û can, bi hevdu re tê hunandin. Dema ku mirovên normal jî, bigêhin tehma zimên, xwendin û nivîsandina kurdî, wê demê pir konkret dikeve nav têkoşînê û ji bo çareserkirina pirsra kurdî fedakariyê dike.

**A. Fevzî (Kurdistan Press):** Belê,

serbestbûna zimanê kurdî gaveke pêşketî ye. Lê nikare stratejiya tevgera rizgariya netewî ya Kurdistanê biguhêre û divê neguhêre jî. Piştigiriya vê gavê kirin îfadeke çewt e. Divê em ji bo gavên pêş, vê gavê bi kar bînin.

**Av. Weysî Zeydanlıoğlu:**

**He** ger ev di çarçoveke fireh de be, gaveke pêşketî ye. Wek di demokratîzekirina Tirkîyê de, guhartina qanûna bingehîn, qanûna cezayî, qanûna partiyên sîyasî, qanûna nufûsê ya ku navên kurdî qedexa dike... Avakirina sazgehên demokratîk û hwd bibin, xweza gaveke pêşketî ye. Heger weha be, divê bi tevayî bê destek kirin. Divê rêxistin û kesên Kurd jî bo vê yekê xebat bikin. Hukimet niha dibêje em qanûna qedexa ziman ji navê radikin û zimanê kurdî serbest dikin. Pirsra Kurd ne bi tenê serbestbûna zimanê kurdî ye. Li gel hinek heqên demokratîk û netewî divê Kurd heta stendina mafê xwe yê çarenûsî têkoşînê bidin domandin.

**Zinarê Xamo (Armanç):** Bi rakin 1932-an ku nîv ranebûye, zimanê kurdî serbest nabe. Di vê pêşniyara qanûna nû de, bi tenê kurdî li mal û kuçê ne qedexa ye. Lê yek rabe bi kurdî erzûhalekê binivîse û bide daîreke resmî ji 2 mehan heta 2 salan hevs û 5 milyon lîra jî cezayê pereyî bixwe. Li cîhê karên şexsî jî her weha kurdî qedexa ye. Ev qanûna nû navên kurdî jî qedexa dike.

Di vê pêşniyarê de hîleyek heye. Ev pêşniyar ne weha, bi awakî fereh jî qebûl bibe û bibe qanûn, dîsan mesela Kurd çareser nake, çimkî mesela Kurd ne mesela ziman e. Mesela mafê çarenûsî ye. Lê wan rakiriye an dixwazînin rakin, çima em ê li dij rakirinê bin? Divê em vê gavê munaqeşe bikin û bikin malê gel. Bêyî destûra dijmin, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin.

**Berbang:** *Em ji bo beşdarbûn û diyarkirina dîtinên we, careke din jî, spasîyên xwe ji we re pêşkeş dikin!*

- Em jî spas dikin.

Di derheqê jîyana Qasimlo de, ji min re hin agahdari pêwîst bû. Min kovara Deng yê ku li Tirkîyê derdikeve derxist pêş xwe û dest bi nîvisandinê kir. Li wir nîvisareke dirêj di derheqê Qasimlo de hebû. Li gor gotina kovarê ev nivîsara ji Rojname Kurdîstan, weşana organa merkezî ya PDK-Îran hatibû vergêrandin. Yê ku vergêrandîye H. Güzel e. Lê belê, di nivîsarê de roja kuştina Qasimlo tune bû. Min bi xwe got tiştê nabe. Ez ê niha kovareke dinê derxim pêş xwe û lê binêrim. Min Kurdîstan Press derxist pêş xwe û lê nihêrt. Roja kuştina Qasimlo li wir hebû, lê belê malûmatên wî ne weke yê Deng bû. Min Kurdîstan Bulletinên Nr 2-89, Berbang Nr 59, Medya Güneşî Nr 10, Deng Nr 6 û K. Press Nr 75(21) derxist pêş xwe û lê nihêrtim, ku çî bibînim, gelek tişt hevdu nagre. Ka em tev li wan binêrin.

- Qasimlo 1945 an da li Êrmiyê Yekîtîya Xortên Demokrat ên Kurdîstan ava kirîye. (Deng)

- Qasimlo, xortaniya xwe de, di nav JK (Komela Jîyaneweyî Kurd) da cih girt. (K. Press)

- Qasimlo xortaniya xwe de, di nav Je-Kaf da di şerê rizgariya Kurd de cihê xwe digre. (M. Güneşî)

- Bi serokatî û xebata Qasimlo li Êrmiyê Yekîtîya Xortên Demokrat ên Kurdîstan tê damezirandin. (Berbang)

- Qasimlo, 1945 an de, di avakirina Yekîtîya Xortên Demokratê ên Kurdîstan de cihê xwe girt. (Ömer Şêxmûs, K. Bulletinên)

Pirs 1: JK-Komela Jîyaneweyî Kurd, Je-Kaf û Yekîtîya Xortên Demokrat ê Kurdîstan yek rêxistin e, an jî rêxistinên cihê cihê ne?

Pirs 2: Ger yek rêxistine kîjan nav rast e?

Pirs 3: Qasimlo di avakirina vî rêxistinê de cih digre, vê rêxistinê ava kirîye an jî weke endamêkî di nav rêxistinê de cihê xwe digre? Kîjan gotin rast e?

- Qasimlo piştî hilweşandina Mehabadê ji bo xwendina xwe berê çû Teheranê û piştê çû Parisê. (Deng)

## Qasimlo û Rojnamegeriya me

- Qasimlo, 1960 î de derket derveyî welêt. Ji bo xwendina xwe berê çû Sowyetîstanê, piştê çû Çekoslovakayê. (K. Press)

- Qasimlo, 1960 î de derket derveyî welêt. (M. Güneşî)

- Qasimlo, piştî ku lîsê ya Teheranê xelas kir, salek li Parisê ma û li Unîwersîta Sorbonê xwend. (Ömer Şêxmûs, K. Bulletinên)

- Qasimlo, sala 1948'an ji bo xwendina bilind diçe Parisê û ji wir diçe Çekoslovakayê û li Unîwersîta Pragê beşa Zanîstiya Civakî û Sîyasî dixwîne. (Berbang)

Pirs 1: Qasimlo herî cara pêşîn sala 1948- an de an jî 1960 an de derket derveyî welêt?

Pirs 2: Berê çû Sowyetîstanê an jî çû Parisê? Li Sowyetîstanê çî xwend?

- Qasimlo, li Parisê bûrsa Yekîtîya Xwendevanên Navnetewayî qezenc kir û bi vî bûrsê li Pragê bi cih bû. (Deng)

- Qasimlo piştî salek li Parisê bûrsa partîya Tûdeh qezenc kir ji bo ku li Unîwersîta Pragê bixwîne. (Ömer Şêxmûs, K. Bulletinên)

Pirs 1: Qasimlo li Parisê bûrsa partîya Tûdeh qezenc dike an jî bûrsa Yekîtîya Xwendevanên Navnetewayî? Kîjan rast e?

- Qasimlo nêzî deh zimanên bîyanî zane. (K. Press)


- Qasimlo, bê zimanê dayikî 6 zimanê bîyanî zanibû. (M. Güneşî)

- Qasimlo Kurdî, Farsî, Erebi, Tirkî, Fransî, Îngilizî, Çekî û bi Polonî zanî bû. (Ömer Şêxmûs, K. Bulletinên)

Pirs 1: Qasimlo çend ziman zanibû?

- Qasimlo, sala 1952'an ji Pragê vedigere Kurdîstanê. (Berbang)

- Qasimlo, 1954'an de ji Pragê



vedigere Îranê. (Deng)

Pirs 1: Kîjan mêmû rast e?

Derê ev kovarên jorîn, Kerîm Husamî jî, di kitêba xweyê Komara Demokratîk a Kurdîstan wisa dinivîsîne:

“Di meha Îlona sala 1942 an de, rewşenbîr û burjuvazîyên biçûk ên Mehabadê Komela Je-Kaf (Komela Jîyaneweyê Kurd) damezrandin. Di damezirandina Komela Je-Kaf de rolek Mîr Hac nûnerê Partîya Hiwa ji Kurdîstana Germîn a giring hebûye. Ew kesên ku damezrenêrên Komela Je-Kaf hatine naskirin ev ên han in: Huseynê Zêrengeran (Firoher), Ebdurrehmanê Zebîhî, Siddîqê Heyderî, Qasimê Qadirî, Ebdurrehmanê Îmamî, Elî Mehmûd, Abdulqadirê Muderrîsî, Mehemedê Nanewazade, Mele Ebdullayê Dawudî, Necmeddînê Tewhîdî, Mehemedê Eshabî, Mehemedê Yahu, Ebdurrehmanê Keyanî.”

Ev tiştên min li jorîn nivîsî ji dubendîyên ku di nav wan kovarên jorîn de beşek biçûk e. Gelek malûmat û dirokên din heye ku hevdu nagirin. Û ez nizanim mirov wê çawa ji nav vî îşê derkeve. Mexseda vî nivîsarê ne rexnegirtina kovarên Kurdîye. Ez bixwe dizanim rojnamevanên me di nav çî kêmasî û zahmetî da nûçeyên xwe çêdikin Ez dixwazim bizanibim tiştên ku ber jîyana Qasimlo de hatîye nivîsandin kîjan rast e, kîjan ne rast e. Dibe ku camêrek vê nivîsê bixwîne û ne tenê min, xwendevanên din jî agahdar bike.

Çile 1991/ Xorto

# KONGRA 11-AN BI HÊZTIRÎN CIVIYA

Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê, di 8 û 10'ê meha sibatê 1991'ê de li Stockholmê kongreya xwe ya 11-an çêkir. Îsal jî 37 komeleyên endamên Federasyonê 205 nûnerên kongrê hati bûn hîlbjartin. Ji 205 nûneran 171 nûner beşdarê kongrê bûn.

Serokê Federasyonê Keya Îzol, di axaftina xwe ya vekirina kongrê de, li ser rewşa Kurdistanê ya siyâsî û civakî rawesta. Bê planî haziriya rêxistinên Kurdan anî zimên. Pirsê bi alikariya navnetewî ve girê da û dewam kir:

-Ji ber ku dinyaya ku em lê dijîn, di merheleke wilo de ye, ku, çî dewlet, çî rêxistinên navnetewî û çî jî organên navnetewî li gor meslehetên xwe gavan davêjin. Li hemû perçeyên Kurdistanê her roj tehdâ, kuştin, êşkence, qetlîamên gelemperî hebe jî, ew heke menfeatê wan tê de hebe, mesela Kurd tînin rojevê, lê, ger menfeatên wan wek dewlet yan wek rêxistin nebe, tû carî jî bo xatirê çavên me yê reş xwe nawestînin, heta naxwazin pirsên weha bikeve rojê wan. Nimûne jî bo vê gelek in: Gava Saddamê faşîst bi hemû hêzên xwe ve, heta bi çekên kîmyewî êrîş bir ser Kurdistanê, bi hezaran însanên bêparêz kuşt û qetil kirin, awira giştî ya dinyayê xema wê nebû, xema organên navnetewî jî nebû. Ji bona nemûne be jî, yek ji serokwezîrên tû dewletî rejîma Saddam mehkûm nekir. Qetlîama Helepçê piştî çend rojan dikaribû li dinyayê aktuel bibe, ew jî bi destê dewleteke dagîrker û tenya jî bo propagandayê xwe. Rejîma kevneperest ya Îranê, heke jî bo menfeata xwe nebûya, bûyerên helepçê tû car demediket derveyê Helepçê..

Keya Îzol di axaftina xwe de, di derheqê Tirkîyê de jî weha digot:

- Tirkîye, ku bi dehan sal zilm û zordestiyên xwe li ser Kurdan dimeşîne, jî bo meslehetê xwe dikare di rojê de, bi gotina pirsê 12 milyon Kurdan bîne rojevê. Lê, em baş dizanin, ku Tirkîye bi vî awayî dixwaze cihê xwe li cem Ewropî û cem Amerikayê xweş bike...

Serokê Federasyonê, di axaftina xwe de li ser kar û xebata Federasyonê jî rawesta:

Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê îsal dikeve 11 saliya xwe. Divan salên borî de gelek bûyerên girîng çêbûn. Federasyon jî rêxistineke biçûk û lokalî derbasî rêxistineke mezin, xwedî giranî û têkûz bû. Her salên ku derbas dibin, jî bo me hemûyan tecrûbeyên mezin cih de hişt, alîkarî da me ku em wek rêxistineke bêhempa, zemîneyeke netewî û demokratîk, jî hemû perçeyên Kurdistanê û bi her babet bîrûbaweriyên cewaz cewaz di bin baskê yek rêxistineke netewî de li ser hev bicivin. Îro Federasyon bi nêzîkî 200 nûnerên vê kongrê, bi 37 komeleyên endam û bi hezaran dilsozên xwe ve platformeke netewî ye.

Ew li ser xebatên federasyonê yê serketî û yê ku hatibûn plankirin û bi cihnehati bûn rawesta û jî kongrê re serketin xwest.

Gelek mêvan di kongra 11-an de başdar bûn. Di nav mêvanan de Serokê Komîta mafên Kurdan li Swêdê CH. Hermansson û Thomas Hammarbeg û serokê Federasyona Tirkîyê axaftin kirin û jî kongrê re serketin xwestin.

Serokê Komîta Mafên Kurdan li Swêdê C H. Hermansson, di axaftina xwe de, behsa zilm û zordestiya ku îro li her çar perçeyan heye kir û axaftina xwe weha domand:

- Di krîza Kuweytê de, hemû gelên Rojhilata navîn û bi taybetî gelê Kurd zerarê dibîne. Şer li ser axa Kurdistanê ye jî. Him li jêr û him jî li jor gelê Kurd di bin tehdîteke mezin de ye. Lê, tiştê din jî heye, ku piştî krîzê dema jî bo helkirina pirsên Rojhilata Navîn konferanseke navnetewî çêbibe; divê pirsê Kurd jî di wê konferansê de cihê xwe bigre. Ev yek jî hêvî dide me.

Niha Konferansa Stockholmê li pêş me ye. Divê em vê pirsê li wir bigrin dest. Pirsê Kurd di seran serê cihanê



*Ji xebata Kongra 11-an wêneyek*

de aktuel bikin...

Ji gelek partî, rêxistin û komelan mesajên serketinê jî kongrê re hatin.

Îsal kongre 3 roj bûn. Roja pêşî jî bo xebatên komeleyên endam bû. Komeleyên endam xebatên xwe pêşkêşê kongrê kirin û li ser wan gotûbêj hatin kirin.

Berî kongrê, komîta kargêr jî bo kongreya 11-an bi tîpên latînî û Erebî bi 62 rûpelî rapora xebatê amade kir û wê li nûnerên kongrê belav kir. Di vê rapora xebatê de, xebat dabeşkirin. Ev beş di raporê de hebûn:



- \* Xebatên agahdarî ya federasyonê
- \* Xebatên pratîk ya federasyonê
- \* Xebatên rêxistinî ya nav xwe
- \* Xebatên Komîta Penaberan
- \* Xebatên Komîta xwendin û perwerdekirinê
- \* Xebat ji bo girtiyên polîtîk
- \* Xebata Berbangê
- \* Xebata Yekîtiya Ciwanan
- \* Listeyên civînên komîteyên Federasyonê.

Raporên Komîtan hatin xwendin. Li ser raporên gotûbêj vebûn. Nûneran li ser xebata Komîta Kargêr a salane rexneyên xwe yê pozîtîv û negatîv kir. Komîta Kargêr bersiva rexnan da. Ji bo rûspîkirina Komîta Kargêr dengdan çêbû û komîta hat rûspîkirin.



Foto: Arif Zêrevanî

Komîta Destûrê pêşniyarên ku ji bo guhartina destûrê hatibûn di çav de derbas kirin û wan bi formolakirineke nû hevpişk pêşkêşî kongrê kirin. Di çend xalên destûrê de guhartin hat çêkirin.

Komîta daxwaz, pêşniyarî û biryaran ji bi wî rengî karê xwe domand û daxwaz û pêşniyariyan pêşkêşî kongrê kirin. Gelek biryar hatin girtin. Di nav wan de çendên girîng ev bûn.

\* Newroz roja Kurdan a netewî ye. Her civatên bîyanî yê ku li Swêdê dijîn, di rojên xwe yê netewî de, naçin

kar. Dewleta Swêdê, rojên wan yê netewî qebûl dike. Divê Federasyon jî li gel meqamên Swêdî hewl bide ku ew roja Newrozê wek roja netewî ya Kurdan qebûl bikin û Kurd roja 21 ê Adarê neçin kar. Di malên xwe de newroz, pîroz bikin.

\* Dewleta Swêdê heta niha di dibistanan de heqê zimanê zikmakî qebûl kiribû. Swêd di vî warî de hema hema li dinyayê yekemîn bû. Niha parlamentoya Swêdê biryar daye, ku zimanê zikmakî bihêle derê şemayê. Piştî girtina dibistanan, divê zarok bi dilê xwe herin dersa zimanê zikmakî. Ji ber vê yekê jî, zarok otomatîk dê ji ber xebatên xwe yê dema vala û zehmetiyên din neçin dersên zimanê zikmakî. An jî hejmara wan dê gelek kêmbibe. Ji xwe dewleta Swêdê jî vê yekê dixwaze, ku zarok neçin dersên zimanê zikmakî û otomatîk zimanê zikmakî ji navê rabe. Ji ber vê yekê, divê Komîta Kargêr a Federasyonê bi dê û bavan re têkilî dîne û wan agahdar bike, ku zarokên xwe bişênin dersên zimanê zikmakî.

\* Hejmara Kurdên ku li Swêdê heta îro ne dîyar e. Meqamên Swêdî jî, bi xwe nizanin çend Kurd li Swêdê dijîn. Ji ber ku Kurdên ku ji Bakur tînin li ser Tirkiyê, yê Basûr li ser Îraqê, yê Rohilat li ser Îranê, yê Başûrê Rohilat jî, li ser Suriyê hesap dikin. Divê di vî warî de Federasyon hewl bide ku meqamên Swêdê, ji kîjan perçe û welaî tînin bila bînin Kurdan wek netewe qebûl bikin û binivîsin. Divê îdendîteta Kurd derkeve holê.

Ji bo organên nû yê Federasyonê hîlbijartin çêbû. Di dawiya hîlbijartinê de, ji bo Komîta Kargêr ya Federasyonê ev kes hatin hîlbijartin:

- 1- Wildan Tanrikulu
- 2- Mahmûd Kîper
- 3- N. Krîv
- 4- Ehmed Karamûs
- 5- Koyo Berz
- 6- Mihemed Hacî
- 7- Berzan Şêxsiwar

Çih gir:

- 1- Mahmûd Kiliçaslan
- 2- Abdurrazak Fehî
- 3- M. Mayî

Li gor destûra Federasyonê, Komîta Giştî û ya Kargêr di civîna xwe ya yekem de Wildan Tanrikulu serokê Federasyonê hîlbijartin. Û Komîta Kargêr jî, di nav xwe de kar parve kir. Ehmed Karamûs bû sekreter û N. Krîv jî bû berpirsyarê malî û Berbangê. Endamên din jî, di nav xwe de kar û barê Federasyonê li hevdu beş kirin. Komîte û planên xebatê çêkirin.


Redaksiyona berbangê ya nû pêk hat û dest bi plan û xebata xwe ya salane kir.

Amadekar: M. Xarpêtî

# Hevalê Xebatkar Mehmet Altan wefat kir

Kurdê welatperwer, Mehmet Altan li bajarê Norköpingê ji ber nexweşîya kanserê wefat kir. Mehmet Altan, di sala 1987'an de ji bo damezrandina Komela Kurd li Norköpingê xebatek aktîv meşandibû û di komîta kargêr ya komelê dê cih girtibû. Heta îro wî karê rêxistinî her berdewam kir û yekîtiya kurdên li Norköpingê parast. Îsal jî bi halê xwe yê nexweş, di rojên 8-10'ên sibatê de di kongra Federasyonê de wekî nûnerê komelê amade bû. Ew her çiqas dizanibû ku bi nexweşîya kanserê nikare zêde bijî jî, ta roja dawî xebatê xwe berdewam kir. Herweha ew endamê rêxistina Rizgarîxazên Netewî Yên Kurdistanê bû.

Heval Mehmet Altan di sala 1958'an de li Kurdistanê Bakur, li navçeya



Mêrdîn li gundê Talatê hatibû dinê. Hê ew 5 salî bû balbata wî ji gund bar dîke û li Dîyarbekirê cîwar dibe.

Ew beriya ku ji welêt derkeve der li Bajarê Erzurumê di Fakulta Zîraatê de dixwend. Lê ji ber terora faşîstan, di sala dawîn de dev ji xwendinê berdide. Di sala 1979'an de ji ber xebatên xwe yê şoreşgerî tê girtin û sala 1980'î ji girtîxanê derdike. Di sala 1983'an de Mehmet Altan derbasî Kurdistanê Rojavaya Başûr dibe. Di sala 1985'an de tê Swêdê. Ew bavê sê kur û keçekê bû.

Heval Mehmet Altan ji roja 20'ê Tebata 1988'an vir de dizanibû ku nexweşîya wî kanser e û tedawî dibû.

Hemû endamên Komîta Karger ya Federasyonê û redaksiyona Berbangê, xengîniya xwe dide xuyakirin û serxaniya malbata wî û xelkê wî dixwaze.

## DAXUYANIYA KOMELA DEMOKRAT A JINÊN KURDISTAN

Li ser nivîsa E.Dalaba ya ku bi navê "Kongra Komela jinan û Du Dokument" di hejmara 69'an ya Berbangê de hatibû belavkirin.

Komela me Komela Demokrat a Jinên Kurd li Swêdê, kongra xwe ya 7'an di roja 25.11.1990'î de civand.

Li gor destûra me şertê vekirina kongrê weha ye:

"Kongre ji sisêyan duduyên (2/3) endaman pêk tê. Divê di kongrê de ji sisêyan duduyên (2/3) endaman amade bin. Eger ev piranî amade nebin, kongre mehekî paştê tê avêtin. Vê carê kongre bê şert pêktê." (Bend 4/6)

Û dîsa di destûra me de dibêje ku şertê endametiye jî ew e kû "endam, divê her sal endametiya salanî, berî pêk anîna kongra salanî bidin".

Di kongrê de ji 140 endaman (endamên fexrî û asîl) 65 endam beşdar bûbûn. Ji bo ku ji wan endaman gelek kes endametiya xwe nedabûn û li gor destûrê jî heqê wan û dengdanê tunebû, me beriya hertiştî heqê endametiye be-

rev kir. Li gor listên destê me 68 kes heqê endametiya xwe dabûn û ji wan kesan 65 kes li kongrê amade bûbûn. Ji bo ku di kongrê de piraniya (ji sisêyan duduyên 68) endaman amade bûn, kongre hat vekirin.

Beriya dengdanê li ser hin meselan munaqeshe hat kirin. Ji wan yek jî ew bû ku hin endam li çend endamên din rexne girtin ku ew çûne di komelên din de jî bûne endam û deng dane. Ji bo ku di kongrê berê de jî hin problemên weha derketibûn, komela me mehek berê ji bo tesbîtkirina wan endaman listên komelan ji Federasyonê xwestibû. Lê gelek komele listên xwe neşandibûn û her weha ew jî nikaribûn wan kesan tesbîtkirin. Me li gor xwestina piraniya endaman qerar da kû em nikarin bê îsbat heqê dengdana endaman ji wan bigrin. Dîsa me bi dengdanê biryar da ku em destûrê biguherînin.

Di vê warî de jî destûra me dibê "Kesên ku endamên vê komelê ne, nikarin bibin endama komelên din ên ku li ser navê jinên Kurdistanî hatine damezrandinê" (Bend 8/d) (Li Swêdê tenê yek komele li ser navê jinên Kurdistanî heye).

Di kongrê de ji listên pêşniyaran yek,

alî piraniya endaman ve hat hilbijartin. Û dûre jî li gor rojevê kongre dom kir û bi serfirazî dawî hat.

Dîtinên gelek endaman yek jî ew bû ku di tu kongreyên çûyî a komelê de tu car hewqas endam beşdar nebûbûn.

Komîta Karger a nû piştî civîna xwe ya yekemîn, rapora kongrê ji Federasyonê re şand. Kesên ku pirsên wan li ser kongrê hebûn dikarin wê raporê li Federasyonê bibînin û bixwînin.

Em hêvî dikin ku heval beriya ku hin dokumentên destê xwe biweşînin, bila wan "dokumentan" baş bixwînin û baş fahm bikin. Her weha jî bizanibin ka şertên endametiya komelê çine. Wek "Mafên hemû endaman wek hev in û hemû endam di dîtinên xwe de azad in, bi şertê ku endam li dijî komelê û armancên wê xebat û propaganda nekin". (Bend 8/c)

Em carek din sipasîya xwe ji hemû endamên komelê û heval S. Rêving re dikin ku li ser navê federasyonê beşdarê kongrê bibûn û ji gelek alîyan ve pirsan ji bo endaman ronî kiribûn.

Bi daxwazên dokumentên konkret!

**Komîta Kargêr a Komela Demokrat a Jinên Kurd Li Swêdê.**

# Berbangeke çawan?

-2-

Heval Amed Tigrîs, li ser form-pergala rûpelan, naverok, ziman û peryodîk derketina Berbangê, çend pirsan ji berpirsiyarên hinek rojname, kovar, weşanxane û kesên Kurd kir. Di vî warî de ditîn û pêşniyariyên wan girt. Em li gor bersivên ku ketin destê me, van ditîn û pêşniyaran bi rêz dikin û diweşînin. Pirs ev in:

## PIRS

Wek ku hûn pê dizanin, kovara Berbangê, ji dest pêkê heta niha bi awayekî peryodîk 68 hejmar derçûne. Bi gelempêri hûn ji aliyên:

## Berbangeke peryodîk, piralî û nûjen

Bi navê kovara Hêviya Gel, em spasîyên xwe ji redaksiyona berbangê re pêşkêş dikin, ku pirs "Berbangeke çawan" ji çapemeniya Kurdistan û ji kovara me dipirse.

Berbang bi hêsani negehêst van rojan. Pir zehmetî hat kişandin. Wextek cîh û îmkânên Federasyonê kêmbû, kompîturê wê yên nivîsê jî tune bû. Hevalên xebatkar ên Federasyonê û kovara Berbangê bi fedekarî xebat dikirin, zor û zahmetiyên mezin dikişandin; lê dişan weşana Berbangê berdewam bû. Jiyanîna Berbangê ya do û îroyê ne wek hev e. Do di taxa Halonbergê de, di cîhek biçûk de (ku cîh tune bû hemû endamên redaksiyonê li wê derê rûnin) ev kar û xebat hat kirin û jîyana Berbangê berdewam kir. Îro ji do pirtir îmkân hene, ku ev kar û xebat bi awakî rêk û pêk pêşve biçê.

Kovara Hêviya Gel, spasîyên xwe ji hemû hevalan re dike, ku ji destpêkê heta niha kovara Berbangê bi awayên curbe cur kar û xebat kirine, zahmetî kişandine û fedekarî kirine, ku Berbangê heta niha dane jîyandin.

1- a) Berbang ji aliyê form û pergala rûpelan ve baş e.

b) Ji aliyê naverokê ve hinek kêmasiyên Berbangê hene. Naveroka Berbangê, divê piralî be. Cîh bide bûyerên civakî-netewî yên li welêt, Swêdê û cîhanê. Di dema çapkirina Berbangê de, di mehê de nûçe, bûyer û agahdariyên ku girîngiya wan hene û di wê mehê de aktualîte ne. Di her hejmarî de bila "rojêva mehê" hebe.

Lêkolînên li ser edebî, zimanzanî, kulturî, civakî, siyasî û pirsên navnetewî bîr weşandin; dê naveroka Berbangê

1) a- form û pergala rûpelan;

b- naverok;

c- ziman û grametîk;

ç- dereng derketin û belavkirina wê ve, çawan dibînin?

2) gelo, di hejmarên îsalin de, kîjan nivîsar balkêş in, çima?

3- niha di nav redaksiyon, Federasyon û komeleyên endamên Federasyonê de gotûbêja "Berbangeke çawan" heye. Gelo li gor we, Berbangeke çawan divê?

## Berbang

xurtir bike. Berbang bi kesên zimanzan, dirokzan ûhw. re hevpeyvîn li ser ziman, edebîyat, civak û dirokê bike, dê gelek bala xwendevanan bikêşîne. Berbang bi awakî demokratî cîh bide munaqeseyên li ser pirsên ziman, dirok, çand, edebîyat û pirsên aborî û civakî, dê naveroka wê xurt bibe.

c) Berbang ji aliyê ziman û grametîkê ve baş e. Lê, problemên wê jî hene. Ev problem ne tenê yên Berbang ne, yên hemû kovarên kurdî ne. Wek her nivîskarê Berbangê, di hemû kovarên kurdî de jî, her nivîskar devoka herêma xwe bi kar tîne.

Dewletên kolonyalîst, bi sed salan in, ku nahêlin zimane kurdî pêşve biçê û bi her awayî dewlemend bibe. Ji ber vê yekê ziman û grametîka kurdî hîn bi awakî baş û rind li şûna xwe rûneniştîye. Ji bo vê yekê divê di Berbangê de quncika grametîka kurdî û rastnivîsandinê hebe.

ç) Dereng derketina Berbangê ne baş e. Lê, derneketina kovarekê bi gelek sedeman ve girêdayî ye. Organên federasyonê û redaksiyona Berbangê sedemên derneketina wê yên taybetî ji xwendevanan baştir û bêtir dizanin. Divê wextê ku Berbang dereng derdikeve, di wê hejmarê de agahdarî hebe, ku ji bo çî sedemî hewqas dereng derket.

Ji bo belavkirina Berbangê ditîna me ew e, ku Berbang bi tenê xwe negihîne destê endamên komeleyên federasyonê, divê Berbang xwe bigihîne piraniya Kurdên ku li Swêdê û li welatên Ewropîyê din dimînin.

2) Di hejmarên îsalin de gelek nivîsên baş û hêja di nav rûpelên Berbangê de hatin weşandin. Nivîsarên balkêş, li gor her xwendevan an kovarê tê guhartin. Lê, bi rastî jî, di hejmarên îsalin de nivîsarên balkêş pir zêde ne. Ji ber ku bersiva me hinek dirêj bû, em naxwazin yek bi

# Dîtinên çapemeniya Kurdan

yek li ser nivîsarên balkêş bisekinin.

3) Munaqêşa li ser form û naveroka "Berbangeke çawan" di her alî de, ji bo pêşveçûna Berbangê xizmetekê baş û hêja ye. Gotûbêja "Berbangeke çawa" li pêşiya Berbangê rê vedike, ku Berbang bi her awayî pêşkeve, bi naveroka xwe dewlemend bibe.

Ji bo "Berbangeke çawan" dîtin û daxwazên me ev in. (Di warê form, ziman û naverokê de me bersiv li jor dabû. Niha em ê çend tişt lê zêde bikin.)

1) Berbang divê peryodîk be û di mehê de carek derbikave.

2) Forma navê Berbangê her wek xwe bimîne, nehê guhartin.

3) Xebatên civakî, kulturî û rêxistinî bi hev re girêdayî ne. Ji bo vê yekê divê Berbang kovarekê civakî, kulturî û rêxistinî (demokratîk) be. Cîh bide bûyerên netewî-civakî-siyasî yê li welêt, cîh bide kar û xebatên kulturî yê Kurdên li Swêd û Ewropayê. Cîh bide pirsên civakî ên malbatên Kurd ku li Swêdê dijîn.

Li Swêdê di nav civata Kurd de pirsên civakî, malbatî (gelo li Swêdê jin 'mêr ên Kurd ji bo çi hevdu berdidin û ji hevdu cîhê dibin? Ev pirseke civakî ye û me hemû Kurdan girê dide û heta niha kesî li ser vê pirsê lêkolîn nekirîye.) Û penaberî qewlê N. Krîv ve "Pirsa pirsan" e.

4) Divê Berbang ji bo kar û xebata federasyonê û komeleyên endam agahdarî (information) bide.

5) Di Berbangê de quncika (? Pirs), quncika "Gotûbêj û lecên edebî" û ya hinek "Çîrok", "Lêkolîn" û "Weşanên Nû" berdewam be.

6) Ji pirs "Berbangeke çawan" re bersiva me bi kurtayî, Berbangeke peryodîk, piralî û nûjen e.

Em bi silavên germ û biratî serketin û têkoşîna û xebata we dixwazin!

Kovara Hêviya Gel



## Kovar ji bo xwendevanan, ne ji bo arşîvan in!

### DIPTEN GELEN DALGA DEVLETI TERORUYLE ONLENMEK ISTENIYOR

Her xwendevanê berbangê... (text continues)

Her xwendevanê berbangê... (text continues)

Her xwendevanê berbangê... (text continues)

1-a) Form û pergela rûpelên Berbangê bi saya teknîkê bi ber başbûnê ve diçe. Ji ber ku formata wê A 4 e, hêsantir e ku meriv pergala rûpelan hîn xweştir bixemilîne. "Sandevîçên" nivîsên dirêj ku li ser rasterîngê bi kar tên xweş in û di cî de ne, lê pirî caran bi tewirê ne. Risim bi tevayî kêm tê bikaranîn. Halbû ku rola risiman pîrr e. Wek Çînî dibêjin "hezar gotin binivîsînî, cîyê rismek nagire." Wek numûne karikatûra nivîsa "Şer Destpêkir" [Hejmar. 69(1/91)] ya Berbangê gelek balkêş e, ku bi deh rûpelan meriv nikare wê karikatûrê analîz bike.

Sernivîsên wê pîrr caran besit in. Mana besit di zimanê rojnamegeriyê de ew e, ku xeynî sernivîsên esasî jorser-

## Li ser Berbangeke çawan dîtinên şexsî

**Muzaffer:** Naveroka Berbangê tevî hev e. Her curen nivîsaran di Berbangê de hene. Divê Berbang di çarçova xwe de weşan bike. Cîh bide karê û xebata li Swêdê. Problemên Kurdên li Swêdê bîne zimên. Kurdên li Swêdê bi hezaran problem û sergêjiyên wan hene. Di hêla weşanê de, ji wan re alîkariyê bike û bibe dengê wan. Agahdariyê bide wan. Rêşanê wan bide. Wek problemên karker, xwendevan, zarok û jinên Kurdan. Nivîsarên edebî, politîk û polemîk divê hinek kovarên din de bên weşandin.

**Abîd:** Bi rastî Berbang wek şorbê ye. Her tişt lê de heye. Mîrov nizane organa çi ye û ji çi re xizmet dike. Belê, di hejmarên îsalin de gelek nivîsarên baş hebûn, lê ev nivîsar ne li gor Berbangê ne. Bila di hinek kovarên politîk û edebî de bên çap kirin. Lê, Berbang xebatên Federasyonê û komeleyên endam biweşîne. Problemên Kurdên li Swêdê û Ewropayê bigrê û giranî bide ser wan. Ji Kurdistanê jî nûçeyên kurt û teze bide. Swêdê bi xwendevanan bide naskirin. Bila nivîsarên li ser ziman û gramefîka kurdî jî hebin.

**Şerexan:** Pirs "Berbangeke çawan" bi serokatiya Federasyonê ve redaksiyoneke çawan ve girêdayî ye. Em dizanin ku Federasyon ketîye destên mirovên nekêrhatî û bê qebiliyet. Ez naxwazim navên kesan bidim, lê gelek kesên ku di serokatiya Federasyonê de ne, bê cewher in. Ev rastî tesîra xwe li ser Berbangê jî dike. Berî van kesan Berbang bê data û teknîkî bû. Lokalekê wê tune bû û kesên ku bi profesyonelî kar dikir jî, ji xwe hiç nebûn. Lê, di van Berbang bi hejmarek zêde û naverokeke baş derdiket. Çima? Ji ber ku fedakarîyek hebû.

# Dîtinên çapemeniya Kurdan

nivîs û binsernivîs tune bin. Sernivîs piçûk tîn nivîsandin. Ku teknîka we rê nade hûn sernivîsan mezin binivîşnin, wê gavê hûn dikarin wan bi herfên mezin binivîsin. Lê gerek hemû sernivîs bi awakî bîn nivîsandin.

Yanî pergela rûpelan wek vîtrîna dikanan in, wextê muşteriyek vîtrîna dikanê binêre ku tevlihev e, ew li wî dikanê tişt nakire. Pergela rûpelan jî wextê tevlihev be û ne balkêş be, xwendevan jî wê kovarê naxwînin, herçiqas nivîsên wê girîng bin jî.

b- Kovar ji bo ihtiyacek tîn derxistin û divê zanyariyek nuh bide xwendevanan. Lê piraniyên kovarên me ji aliyê nûçeyan ve ji bo arşîvê ne û ne tiştekî din. Berbang jî di warê nûçeyan de, qe ne be bila bibe arşîva Federasyonê.

Berbang berî her tiştî kovara Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê ye. Lazim e giraniya xwe bide ser karûbarê federasyonê, pirs û pirsegirêkên civata Kurd ya Swêdê. Zimanê wê divê besît be, mijarên wê jî balkêş bin.

Divê di navbera naveroka rojnama Armancê û kovara Berbangê de ferqek hebe, ku ferq tune be, wê gavê tê wê manê ku yek ji wan bi wezîfa xwe ranabe.

c- Ku meriv hejmarên Berbangê yên berê û yên van salên dawiyê bide ber hev di warê ziman de pêşketinek berbiçav heye. Lê, mesela gramatika zimanê Kurdî ne tenê mesela Berbangê ye. Lazim e, hemû mûsesên heyî û zimanzanên Kurdan li hev bikin ku gramatik û hin herfan wek hev bi kar binin.

ç- Derengderketina kovarên Kurdî problemeke tevgera rizgariya Kurdistanê ye. Hemû kovarên Kurdan di wexta xwe de dernakevin. Lê, îmkânên federasyonê hene û dikare di wexta xwe de kovara xwe derxe. Marifet ne ew e, ku meriv navê 10 kesan di redaksiyonê de binivîsîne ku fêkiyên wan ê salê 7 yan jî 8 hejmar be. Fedekarî û xebat divê.

2- Bi a min di hejmarên îsalî de nivîsên balkeş wek mijar "pirsegirêkên zarok û ciwanên Kurd li Swêdê", "Quncika Tenduristî" û nivîsên "Abid D." nin. Ez bûm şahid ku hin kes piştî ku "Quncika Tenduristî" ku li ser "Cigarekêş" an bû xwendin, dev ji cigarê berdand. Ev tê wê manê ku nivîs gihîştîye armanca xwe. Nivîsên ku min bahsa wan

**Şiyar:** Divê Berbang di wextê xwe de derbikeve. Berbang jî xwe re qadroyan çêbike.

Beşa kulturî û civakî di giraniyê de be. Wek pirsên jinan, zarokan, ciwanan û h.w. bîne ziman. Bi dîtineke netewî jî her çar perçeyan nûçeyên teze û bê şirove bide.

Divê Berbang xwe neke şûna kovareke sîyasî û wê rola han negre ser xwe; lê di vî warî de, ji doza Kurd a netewî û demokratîk re piştgir û alîkar be.

Berbang dikare ji bo zarok, ciwan û wêja kurdî pêşbirkan çêbike. Ev xizmeteke baş e.

**Mustafa Uzun:** Berbang di çapemeniya kurdî de dengê Kurdan yê nemir û bilind e. Kovara Kurdan a demokratîk û netewî ye. Ji her çar perçan kes di nav de hene û li Swêdê dengê hemû Kurdan e. Bi ya min Berbangê giraniya xwe daye ser nivîsarên sîyasî û herweha jî armanca xwe dîr ketîye. Berbang kovara federasyonê û komeleyên endam e. Li Swêdê ye. Divê em bizanibin li kû derdikeve. Divê statîstîk bîn çêkin, ka çend kes Berbangê dixwînin û dîtinên wan çî ne. Li ser wan munaqêşe vebê û Berbang jî çarçoveyêke teng derkeve.


**Simko:** Divê di Berbangê de grammer û zimanekî yekgirtî hebe. Niha her kes li gor devoka xwe dinivîse Di Berbangê de çewitîyên nivîsandinê û rêzkirinê hene. Divê ew bîn rast kirin. Di hejmarek de li ser mijarek çend nivîsar hene. Mesela di hejmara berê de li ser krîza Xelîcê çend nivîsar hebûn. Divê di her hejmarî de mijar gelek û rengîn bin, ku bala gelek kesan bixşîne.

Berbang heta niha, li ser pirsê karê hunerî qet ranewestaye. Divê beşên hunerî jî, di Berbangê de hebin. Hunermend jî, ji Berbangê re alîkar bin!



Ser di navbera millet û hêzên metingehkar de derket

Vedat Aydın di malikemede bi Kurdî axaft



kir ew jî balkeş in û problemên girîng yên civata Kurd e, ku dikeve nava karûbarê federasyonê.

3- Bi dîtina min îmkânên federasyonê hene, ku Berbangê (yan jî rojnameyek bi navek din) di forma "Armancê" yan jî "Kurdistan Pressê" de, ji 15 rojan carek, 6 yan jî 8 rûpel derxe. Rojname divê rismên wê pîr û zimanê wê gelek basît be ku piraniya xwendevanan jê fehm bikin. Yanî wek rojnamek înfomatîv ku karûbar û aktîvîtên federasyonê, komelên federasyonê û pirs û pirsegirêkên civata Kurd ya Swêdê bîne zimên. Ji aliyê postekirinê de jî wê ev kar hêsa be, ji ber ku bi kêmasî her meh federasyon agahdariyek xwe ji endamen re dişîne.

Kovarek "çandî, edebî, lêkolînî" jî, ji sê yan jî çar meh carek bi alîkariya Yekîtiya Nivîskarên Kurd derxe. Ji ber ku ihtiyaciyan wan jî, ji kovareke wiha re heye.

Ji Redaksiyona Armancê  
Lewend Firat

## **SIMKOYÊ ŞIKAKÎ**

**Nivîskar: Kerimê Husamî**

**Wergeran ji tîpên erebî: M. Mayî**

Di meha hezîrana çûyî de, 60 sal bi ser kuştina Sîmail axayê Şikakî de, li bajare Şino, bî hîle u planen hûkûmeta ecem derbas bûn. Şirovekirin û lêkolîna li ser xebat, berxwedan û hikimdariya Simkoyê Şikakî, di kurtegotarekê mîna vê de, tune. Di nivîs û karê kesên nivîskar û siyasetger biyanî de, bi firehî behsa Simko kirine. Navê Simko di nav kurdan de pir belav e. Lê mixabin ku, mêjonivîsên kurd, gelek kêr awir li siyaset û raperînên wî dane, bi tenê di nivîsarên hinekan de mîna hikayet behsa wî hatiye kirin, lê li ser Simkoyê Şikakî bi şeweyekî zanistî tu lêkolîn nehatiye kirin. Ango gotareke mîna vê, kurt jî, bi tenê dikare quncikek ji jîyan û berxwedana Simko derbixe û ji bo bîranîna vî qehremanê mezin, behsek kurt pêşkêşî xwendevanan bike.

### **SERÛBERÊ WELEÛT**

#### **DI SERDEMA PIŞTÎ ŞERÊ YEKEM Ê CÎHANÎ DE!**

Piştî şikestina berxwedana Şêx Ubeydullah, di sala 1880 :an de, li Kurdistanê Îranê bi zora serokeşîran û mîrên kurdan bi armanca siyasî û netewî bûn, vemirîn.

Herçend, car car eşîretên Gelbaxî û Ciwanroyî ji bo ku malbatên xwe ji dest nedin, serbizavek dikirin, lê di rastiyê de, ne xwedî armanc û programeke netewî bûn.

Di serdema Paşetiya Muzaferdînê paşayê qaçar de, serûberê Îranê gelek aloz û perîşan bû. Her serokeşîreki di mintiqeya xwe de hukum dikir. Eşîreta Şikakî, ku mezintirîn eşîret bû di Kurdistanê Îranê de, li heremên Selmas, Ormîye û derdorê wê hukum dikir. Wê serê xwe ji bo hukumeta Îranê neçemand.

Muhemed Axayê Şikakî, serokê tayfa Ebdâyî, di vê deverê de hukum kiribû destê xwe û bersivên hukumetê ne didan.

Di sala 1905 an de, dema ku şah Muzaferudîn li sefera Ewropa bû, dewleta Îranê yek bi navê Nîzamulseltene kire waliyê Azerbecana rojava (ku li gor nexşeya cografîya Îranê, Kurdistanê Îranê jî di nav de ye). Nîzamulseltene dixwest ku, destledariya hukumetê bixe ser eşîra Şikak. Lê zanî bû ku ew bi şer nikare bi Muhemed axayê Şikakî. Ew mîna hemû serdestên bêbext, ket ber pîlan, ûtelî danîn. Wî bangî Cafer axa (kurê Muhemed axayê Şikakî bû) kir. Li Tebrîzê bi quranê sond xwar ku ew xiyaretê digel wî de nake.

Cafer axa dilpak bû, baweriya wî bi quranê hebû. Ew bi Mîrzayê xalê xwe û şeş kesên din re çûne Tebrîzê. Di pêşiyê de ew bi germî xêrhatinê lê dikin, lê li aliyê din, di navbêra Ermenî û Azerbêcanîyan de şer hebû. Waliyê Azerbecanê (Nîzamulseltene) li Tebrîzê, taxa (mehella) Ermenîyan da



dest Cafer axa da ku emniya wî biparêzin. Lê li alê din jî, nexşe ji bo kuştina wî danîn.

Rojekê şande pey wî ku ew were ba walî. Li derdorê jî, bose (kemîn) danîn ku wî bikujin. Cafer axa jî bêxeber hate cem walî. Wî mirovên xwe li derdorê belav kirin û ew bi derecan ve serket û çû cem walî. Xwefiroşên walî wî dibînin û yek teqê li wî dîke û wî dikuje. Dema ku mirovên wî guh li dengê teqê dikin, bi lez diçin ser kelaxê wî. Lê dema ku wan zanî bû ku nikarin kelaxê wî rizgar bikin, ew ji bo ku xwe rizgar bikin, xwe tavên ser dîwar û serbanan û bi şer xwe ji nav bajêr rizgar dikin. Ji wan jî du kes tên kuştin. Walî siwarên xwe li pey wan dişîne ku ew xelas nebin. Ew li "Eronq" digihên wan; ew pênc kesên qehreman piştî ku çend siwaran dikujin, hespên wan digirin û bi wan hespan xwe digihîjin Kurdistanê. Kuştina Cafer axa bi hîle û teleyên dewleta Ecem, karek mezin li ser Muhemed axa û Simeîl axa kurê wî dîke. Ew biryar didin ku li dijî dewleta ecem şer bikin. Dikevin kar û xebatê ji bo ku serdestiya Eceman ji Kurdistanê rakin û ew bi xwe hukum lê bikin.

Simaîl axa, mîna hemû serdar û siyasetgeran, ji bo ku bigihêje armanca xwe, dixwest feydê ji wê aloziya di navbera herdu dewletan (Tirk-Ecem) de hebû, bigre. Di wê demê de, komîsyona sînorên Îranê û Osmanîyan li ser axa Kurdistanê di cîre cîrê de bû. Li gor biryara kongra Berlînê devera cihê Şikakan, Qîtor ji Îranê re dima. Dewleta Osmanî bi vê

yekê ne razî bû. Simko feyde ji wê çendê kir û ew dever xiste bin destê xwe.

### PÎLANA JI BO KUŞTINA SIMKO

Piştî ku Simko veqetandina xwe ji hukûmeta Ecem eşkere kir, dest pê dîke, leşkeran kom dîke û serdestiya xwe di heremê de zêde dîke. Waliyê Azerbêcanê Mukeremulmulk zanîbû ew bi ser dereqeta Simko nayê, ew jî dîke ber pîlan û teliyan ji bo kuştina Simko. Ew bombeyekê çêdike û bi navê qutiyeke şêraniyê ku xesûya wî jê re diyarî kiriye, dişîne. Derbarê vê çendê Simko bi xwe wilo dibêje:

"Em li deşê, li ser giyayê hêşîn rûniştibûn, dema ku ew qutî anîn. Kurê min bi xeyala ku eva şêranî ye û dapîra wî jê re şandiye dixwest wê zû veke. Di wê gavê de, hate bîra min dema ku Heyder Emoglı qotiyeke bi navê şêraniyê ji bo Sucaî Nîzam şandibû. Lê dema ku wî qutî vekirî bû, ew peqî bû û ew kuştibû. Ez jî ketim şikê, min got, wê jî dûr ve vekin. Gava ku devê wê vekirin, min ronîyek dît, min zû kurê xwe himbêz kir û xwe avêt erdê. Bombe peqî, ez û kurê xwe ji mirinê filitîn, lê Eliyê birayê min û çend kesên din hatin kuştin".

Ev karê pîs Mukeremulmulk di sala 1919 an de, li dijî Simko kir. Wî dest pê kir ew dever ji serdestiya hukûmetê paqij kir. Riya navbêra Tebrîzê û Ormîyê girt. Hukûmetê bi tenê di reya derya Ormîyê re karî bû were Ormîyê.

### ÇAWA SIMKO MAR ŞIMON KUŞT?

Paşî şerê yekem ê cihanî û paşî qetliama Ermenîyan li Tirkîyê, nêzî 25 000 Asorî û Ermenî ji Tirkîyê revîyan, hatin Îranê li deverên Selmas û Ormîyê cihniştin bûn.

Ew di dema şer de, ji aliyê leşkerê Rûsî ve hatibûn biçek-kirin û destên Emrîka alikariya wan dikir. Ji aliyê din jî ve, wan têkilî bi Îngilîzan re jî hebûn. Ew li wê hêviyê bûn ku, li deverên Selmas, Ormîyê û Hekarî, dewleteke Asorî bête damezrandin. Herdû hukûmetên Rûsî û Ingilîzî, dest di danîna nexşeya vê pîlanê de hebûn. Wan dixwest ku dewletek ji darê wan li hember Tirkîyê hebe û paşî ew devera Hekarî û Wanê jî bixne ser. Ji bo ku ew bi vê armanê ve bigihin serokê bilind yê leşkerê Ingilîzî, hewil dabûn ku, di navbera Kurd, Asorî û Ermenîyan de yekitiyê pêk bîne. Çûnkî wî zanîbû ku bêy razîbûn û alîkarîkirina Kurdan, ev pîlane bi sernakeve.

Dema ku Asorî diçin devera Ormîyê, dest bi talan û kuştina xelkê dikin. Desthilata xwe bi ser wê deverê de dikin. "Mar Şimon" merkezê xwe datîne Xisrew Awa, li nêzik Selmas û dest bi hikimkirinê dîke.

Kisro, nivîskarê diroka Iranê dibêje; "Asoriyan bi hêsanî bajarê Ormîyê xiste bin destê xwe. Mar Şimon dixwest ku Simko bixapîne. Wî jî Simko xwest ku ew li cîyekî hevdu bibînin. Wan biryara xwe girtin ku, roja 25.02.1918'î, ew li Kevneşar hevdu bibînin. Di wê rojê de, Mar Şimon bi 140 siwarên çekdarên xwe yê bijare re diçin Kevneşar ê".

Seyda El'edîn Sicadî di kîteba xwe ya bi navê "Şorişên Kurdan" de wilo dibêje; "Rûsên Qeyserî dixwestin ku, di wî welatî de, li hember Bolşevîkan astengî çêbikin. Li aliyê din, ew di wê fikrê de bûn ku, ew dengê kudatîyê, yê ku li wê deverê hebû, wî jî jinav bibin û nehêlin. Rûsan bi Mar Şimon




re gotubêj kirin û hemî soz dane wî. Di wî welatî de, Simaîl Axa (Simko) hebû. hebûna wî astengiyek mezin bû, çî di rêya Qeyserîyan û çî jî di rêya Mar Şimon de.

-Çare tune, bitenê eger Mar Şimon bi Simko re gotubêjan bike.

Ew anî, di destpêkê de, bi navê çêkirina dewleteke Kurdî/Ermenî, bi Simko re axift. Lê di rastî de jî, wî dixwest ku Simko û kurên wî ji holê rake û yekser ew dewlet bibe dewletek Asorî-Ermenî. Hêza Mar Şimon wek gotibû, çekdarên temrêndayî, ew hemî li bin destê efserên (qumandaren) serbazî da bûn. Ji aliyê din ve jî, Rûsan alikariya wan dikir. Lê hêza Simaîl Axê ne hinde bû. Ya ku hebû jî eşîrkî û netemrîndayî bû. Kesek jî nebû bi çek û cebilxanan alikariya wî bike. Ango, kuştina Simko ji bo Mar Şimon mîna vexwarina avê hêsan bû."

Derbarê hatina Mar Şimon bo cem Simaîl Axa ji bo gotubêjê, Seyda El'adîn Secadî dibêje: "Ew bi cilên xwe yê 'al û dal' mîna serokekî ronahiyê îro yê xwedî desthilat û mîna padîshahekî bi hêzî sibê, ew li ser diroşkek çar hespî ku her çar aliyên diroşkê bi ava zêrî reng kirine. Şeş efser bi wî re bûn ku çar jî wan efserên rûsî bûn. Duda jî wan li ser diroşka çar hespî û çar jî li dû wî dihatin û şûrên xwe yê rût di destên xwe de girtibûn. Kalanên şûrên wan hemî jî zêr û merseyê bûn. Dema tavê li vê al û wala paşayî dida, sehmeke mezin diket wê derê. Mar Şimon bi vî rengî hat û li mala Teymûr Axayî peyabû. Paşê wî Simaîl Axa jî diçe Kevneşarê û doz dîke ku destekek ji paşî wî bigihîne wê derê. Lê diyar e ku Simko di pêş xwe de hinek çekdar şandibûn û li derdora mala Teymûr Axa bûse vedabûn. Gava ku Mar Şimon hat, peya bû, siwarên wî jî peya bûn û hevsar di dest de ew rawestan.

Kisro di vî warî de dinivîse: "Haya me ji gotubêjên Simko û Mar Şimon tune. Lê Simaîl Axa bixwe gotiye ku Mar Şimon ji Simaîl Axa re gotibû; Ev walatê ku niha jê re Kurdistan dibêjin, ew welatê me ye! Lê cihêbûna olî em ji hev belav kirine. Niha divê em hev bigrin, û welatê xwe



bistînin û bi hev re bijîn. Me leşker komkirine, eger hûn ji bi me re bin, emê Tewrêzê jî bigrin."

Dema ku Simko bi plana Mar Şîmon dihese, ew bi pêkênî soz dide wî. Mar Şîmon tête der, gava ku dixwaze siwar bibe, çekdarekî Simko berê tifinga xwe da wî û teqe li wî kir û kuşt. Şikakan ji her alî tifing berdane siwarên Mar Şîmon û nêzikî sed kesan ji wan kuştin. Her wê rojê, Simko dizivire Çariyê. Roja din, di berbangê re leşkerê asûriyan êriş dikin ser Simaîl Axa. Li gundên derdorê kuştînin dikin û tu kesî sax li paş xwe nahêlin. Simko berxwedanek mezin dîke. Lê neçar dibe, xwe bixşîne paş û Çariyê bi cih bihêle.

Di encama kuştina Mar Şîmon de, gelek xelkên Selmas û Êrmîyê bi destê Asûriyan hatin kuştin. Leşkerê Tirkîyê hat û Asûrîşkestin û xwe gihandî Sanîqela cem leşkerê Îngilîz. Kuştînin û talana asûriyan ji alî xelkê deverê ve behsekî dirêj e û di vê gotarê de cih nîne ku em qal bikin.

Elî Dibistan nivîskarê Dîroka Êrmîyê dibêje: "Piştî kuştina Mar Şîmon, file û Asûriyan 159 rojan li devera Êrmîyê kuştin kirine, 140.000 jin, zarok û mêr kuştine. Bajar û gund talan kirine. Li vîr divê mirov bipirse: Gelo ma Simko, Mar Şîmon bê sebeb û bê belge kuştîbû? Di vî warî de, bîr û baweriyên cihê hene. Hin nivîskar vî karê Simko mîna çewtîyeke mezin li qelem didin. Lê li gor hinek belge û nivîsaran, Simko zanîbû ku mar Şîmon, bi arîkarîya Rûs û Îngilîzan, dixwaze desthilata xwe di wê deverê de bi cih bike. Ne dîr e ku ew ji bo dijîtiya hukûmeta tirk, li Kurdistanê ji wî re hukûmetekê saz bikin. Nemaza ku em dibînin çend paşî wê, Îngilîz Petros Asûrî yê ku piştî Mar Şîmon bûbû femandar û serokê asûriya, wan ew li Konferansa Lozanê bilind kir. Ew dixwaze ku li Kurdistanê ji wan re cih çêbikin, mîna çawa ji bo cûhuyan li Filistinê çêkirine. Di vî warî de nivîskarê îranî Melîk ul Şuarayê Buhar, di kitêba "Partîyên Sîyasî" de dinivîse: "Di konferansa Lozanê de Petros Asûrî bi alîkarîya Londonê bilind dibe û doz dîke ku Asûrî û Keldanî milletên kevnare û ji qedîm de nîştîmanê wan sînoren Mûsilê, Kurdistanana Osmanî, Kurdistanana Îran û heta Êrmîyê ye. Divê

cihê wan bête dan û merkez û binkên taybetî ji bo wan bêne dan. Wî qala wê kir ka Asûriyan çend ji bo Îngilîz û Rûsan xizmet kiribû."

Di sala 1919'an de, Simko ji bo pêşxistina desthilata xwe, xebata xwe diwartir dîke. Riya di navbera Tewrêz û Êrmîyê xist bin kontrola xwe. Di destpêka 1919'an de, Supehdar 'Ezem- Supa Salar dibe walîyê Azarbêcanê. Ew Ziya-ul Dewle dîke hakimê Êrmîyê. Ew jî dest pê dîke, xelkê bi çek dîke. Der û riyan digre û xelkê amade dîke ku ew bajêr biparêzin û bersinga Simko bigrin.

Simko dixwaze ku ew hakim bidize û 60 çekdarên xwe dişîne bajêr, ji bo ku ew hakim ji bajêr derxin. Gava ku çekdarên Simko diçin, li derdora mala hakim teqe dikin, xelk li hember wan radibe, ew neçar dibin û bi destên vala dizivirin.

Simko ji serneketinê hêrs dibe, ew Tahir Beg dişîne ku riya deryayê jî bigre. Bi vî karî wî karibû her du riyên avê û destê di navbera Tewrêz û Êrmîyê de bigre.

Walîyê Azerbêcanê Supehdar zanîbû ku ew bi şer zora Simko nabe û rê venabin. Wî serdar Fatih bi konsulê Îngilîz re şand ba Simko. Hinek pere û şûrekî ji cewher û leqeba "Serdar Nusret" ji alî hukûmetê ve pêşkêşî wî dîke. Simko dibêje: "Ez vê leqebê û xelatê bi mercekê werdigirim ku walî, hakimê Êrmîyê derxe. Piştî konsulê Îngilîz vedigere, walî şertê Simko qebûl dîke. Ew gazî hakimê Êrmîyê Ziya-ul Dewl dîke û Serdar Fatih şûna wî dîke hakimê Êrmîyê.

Hakimê nû bi konsulê Îngilîz re bi riya deryayê diçin Êrmîyê. Simko heta gundê Mîyawe diçe pêşwaziya wan û bi hev re diçin bajêr. Piştî wê Simko organên xwe çêdike û bi çekdarên xwe ewlehîya bajêr diparêze.

Ji aliyê din, dewlet mirovekî bi navê "Esed Axa Xanê Fişekçî" bi çend kesan re ji bo parastina bajêr dişîne Êrmîyê. Ew bi kesên xwe ve li bajêr dijatiya Simko dikin û riya avê dixin bin kontrola xwe.

Simko xeber dide hakim ku ew bajêr bihêle û derkeve, da nebin sedema şer û xwînrijandinê. Hakim cihê xwe di hêle û ber bi Tewrêzê ve dide rê. Lê ew Elî Ekber Xan li şûna xwe di hêle. Piştî hakim Serdar Fatih diçe, Simko Elî Ekber Xan digre û Emer Xanê Şikakî li şûna wî dîke hakimê Êrmîyê. Bi vî karî, bajar bi temamî dikeve destê hêzên Kurdistan.

Dema ku Îran ev yek zanî, leşkerekî mazin bi serokatîya efserekî rûs, Filîpov, dişîne ser Simko. Di Reşmeha 1919'an de li Selmas şerekî mezin rû da. Di pêncê wê mehê de leşkerê dewletê bajarê Selmas girt û leşkerê Simko neçar ma ku xwe ber bi çîyan ve bide paş. Filîpov çar aliyên wan digre. Her çend leşkerê Simko şerekî mêrane dîke, lê di destê leşkerê dewletê de dikevin tengaviyê. Dema ku Simko vê rewşê dibîne, ew telegrafêkê ji bo walîyê Azerbêcanê Eynil Dewle dişîne û daxwaza gotûbêjan dîke.

Walî ferman dide ku Filîpov gotûbêjan bike. Di gotûbêjan de biryar didin ku şer raweste û Simko van xalan bi cih bîne:

- 1- Ew serbaz û efserekan tirk ji cem xwe derxe,
- 2- Êdî ew destê xwe nexwe nav karûbarên Selmas û Êrmîyê,
- 3- Çekê xwe deyne,
- 4- Tole û talanên ku bi "Likistanê" ketin, bide wan,
- 5- Ew Ehmed Axayê birayê xwe bişîne Tewrêzê û bila li



wir bimîne.

Paşî vê biryar û gotubêjê, şer rawestiya û Filipov zivirî Tewrêzê. Carek din Simko leşkerê xwe kom kir û Omerxan kire hakîmê Ormiyê. Êdî di şûn de, Simko pirsra "Begligî" û Serxwebûna Kurdistanê tîne holê, destgayên hukumetî dadimezrîne, desthilata xwe bi ser deverên Selmas û Ormiyê de fireh û bi hêz dike.

Li vir em meseleke Şikakan behs bikin: Dibêjin dema ku Omerxan hakîmê Ormiyê bû, bangî xelkê kir ku li baxçê Qeyser xanim kom bin. Dema xelk kom bûn, Omerxan ji wan xwest ku ew gerek 4 hezar tifeng û 40 hezar lîra kom bikin û bidin. Dibêjin êdî Şikakan kabrayek digirt û jê re digot, tu gerek hinças bidî. Wî hêvî ji wan dikir û digot ku tiştêk tune. Wan jêre digot: "Sen wêr goy olmasin" an "Tu bide bila te nebit".

Bb kurtî; dema ku dewleta Îranê nikarîbû were Ormiyê û bi leşker ji ew nikare derbas bibe, xwest ji aliyê Sablaxê ve leşkeran bişîne Ormiyê. Major Melîkzad bi 800 leşkeran ve di rêya Mêrxasê û Mîyandawê re dişîne Sablaxê ku bên bo Ormiyê ji bo ku ew Simko ji nav bibin. Diyar e ji ku li vê deverê hêvî bi Qerepaxên Sindûs hebû ku ew alîkariya Melîkzade bikin. Ji kevn de Şah Ebbasî ew li dijî kurdan bi kar anîbûn û her dem ew dever li piştî hikmetê bûn û li dijî kurdan bûn.

Dema ku Simko wê dizane, ew li pêş wan Seyd Taha dişîne ku ew rê paqij bike û Qerepaxan jî ji çek bike. Seyd Taha jî ferman dike ku nabe tu kes li Sindûsê çek hebe, gerek her kes çekê xwe teslîm bike. Qerepaxên Sindûs jî edî dizanin ku ew nikarin li hember Şikakan rawestin, ew diçin pêşwaziya wî û çekên xwe jî datînin.

Paşî wê, Simko bi hêzeka siwarên perdaxê ve tîn Sablaxê, Melîkzade digirin û gelek ji cendirman jî dikujin. Paşî wî şerî, êdî eşîretên Zertza, mameş, Pîran, Mengor, Dîbokrî, Feyzullah beg û Gewrik serê xwe ji bo Simko diçemînin û ji Xuyê û Selmasê heta Banê û Dîwanderê bi temamî dikevin jêr ferman û desthilata Simko.

Diyar e, ku nabe di behskirina leşker û desthilata Simko de em çavên xwe li kirinên ne baş û talanên leşkerê Şikakan bigirin.

Ew tiştê ku leşkerê Şikakan anîbû serî xelkê ji bîrûbawera niştîmanî û desthilatdariya neteweyekê dîr bû. Li Sablaxê, Banê, Bokanê û cihên din, ji bilî talankirina malên xelkî, wan mêr jî digirtin û cilên wan ji wan distandin. Her karên nebaş dibûn sedema wê ku xelkê wan ciyan piştgiyî wan nekin.

Paşî ku Melîkzade girt û gelek cendirmên wî kuştin, û leşkerên Şikakan bi seroktiya Seyd Taha çûne deverên Seqiz, Bane, Dîwanderê, êdî li bakûr û navenda Kurdistanê Îranê bi awakî eşîrtî û bi navê desthilata kurdan, destgehên Simko hatin damezrandin.

Di sala 1921'an de, ji bo lêdana Simko, hukmeta Îranê leşkerêkî din bi serokatiya Emîr Esede Qerecedaxî yê ku bi navê Samxan navdeng bû, hazir dike. Mîna Hîdayet di bîranîne xwe de dinivîse: Samxan bi sê hezar siwar û peydan re bi rê ket. Li bajarê Xuyê jî 1500 cendirmê bi xwe re birin. Îqbal dewle yê Makoyî jî hezar siwar bi xwe re anîn. Hejmara wan bû 5500 kes ku biçin ser Simko.

Di roja 28'î meha çîleya 1921'an de, li Şekiryazê li navbera Selman û Dola bixwîn de ew bi leşkerê Simko re bi şer çûn.

Di destpêkê de, kurd neçar bûn ku ew ji ber leşkerê eceman paşdebiçin. Lê piştî kuştina Samxan serleşkerê Îranî, êdî leşkerê eceman ji hev diqete û direve. Heta bajarê Xuyê, Şikaka bi dû wan de çûn.

Paşî vê serketinê, Simko, Omerxan ji hakimiya Ormiyê dixwe û Teymor Axayê xelkê Koneşara Selmasê dike hakim û hikmeta xwe dadimezrîne. Rojnama Kurd mîna organa hikmeta Simko, bi sernivîseriya Mela Mehemedê Turcanî dest bi weşanê dike.

Di meha sibata 1921'an de Rezaxanê Qazax bi alîkariya Ingilîzan, li Îranê inqilabê dike û dibe serokê hemî hêzên çekdarên Îranê. Yekemîn pêngava Rezaxan, rêkûpêk bi hêzkirina leşkerê Îranê bû. Her di wê demê de, wî dixwest ku serokeşîr û Beg û mezinan ji nav bibe. Ji bo ku ew piştî cebha Simko bêhêz bike û rêya Tirkîyê lê bigre, wî di 25 Oktobira 1922'an de, bi Ataturk re peymanek di navbera her du dewletan de, li dijî bizava kurdan muhr kir.

Rezaxan ji bo kuştina bizava Mîrza Kuçixanî li Gîlan, diçe wê deverê. Piştî şikestina wê bizavê, Cengelî, kurdekî Kirmansahî bi navê Xalo Qurban ku bi Mîrza Kuçixan re bû, xwe teslîmî Rezaxan dike. Ew jî li wî dibore, bi wî mercî ku ew here Kurdistanê û Simko ji nav bibe. Xalo Qurban, yê ku em niha ji yên mîna wî re dibêjin ceşîk, bi dar û desgeya xwe re tîn Tevrêzê û ji wê derê jî, ber bi Sablaxê dikevin rê. Li gundê Îdirgaşê, li nêzî Ablaxê, wan konê xwe li erdê vedan, bi wê xeyalê ku ew piştî bêhnvedanê biçine nava bajêr. Hêzên Şikakan û Siwarên eşîran bi serokatiya Seyid Taha li Sablaxê bûn. Dema wan tê derdixist ku leşkerên Eceman li nêzî Sablaxê ne, li berbangê hêrîş dikin ser wan, yên kuşt kuştin, yên din jî ji hev qetyan û revyan. Kake Siwarê Mengorî hêrîş dike ser Xalo Qurban û wî dikuje. Li Kurdistanê Mukrîyan, beytek li ser vê bûyerê heye ku dibêje:

"Xalo Qurban rih korya ker

Rabe ji xewê, te Simko hate ser."

Piştî kuştina Xalo Qurban, Rezaxanê qumandarê leşkerê Îranê, leşkerêkî mezin bi serokatiya sertîp Emanullay Cîhanban amade dike û dişîne ser Simko. Weke "Ehmed Porî Kawyan" dinivîse, ku hejmara vî leşkerî 15 hizar bûn, bi top û siwar û ceşîkên xwe ve. Piştî du rojên pîrî şerê mêrxasîyê, hêza Simko neçar ma ku Selmasê bi cî bihêle û ber bi Çaryê paşde here. Leşkerê dewletê ket dû wan û çar rexên kela Çaryê girtin. Piştî şerekî giran, Simko Çaryê jî bi cî dihêle û diçe Tirkîyê. Hêzên dewletê Çaryê digirin, malên xelkê talan dikin, gund bi mala Simko re wêran dikin.

Bi kurtî, piştî çar salan, Selmas û bajarê Ormiyê cardin dikevin destê dewleta Ecemê.

Simko bi hêzeka kêr ve diçe nav Kurdistanê Tirkîyê. Lê tirk wî ji çek dikin, dibin li Başkaleyê, li gundekî wî dest bi ser dikin. Diyar e piştî peymanê di navbera Îran û Tirkîyê de, êdî tirkan qewl û qîrarên xwe yên ji bo alîkariya Simko avêtin pa guhê xwe, ne her ew, lê wan hewla nehitina wî jî dikirin.

dom dike...

# Kompîtur û zimanê kurdî

Her roj teknîk pêşve diçe û tiştên nû dertên. Bi taybetî di hêla kompîturê (datayê) de, pêşveçûneke bê hempa heye. Di van 10 salên dawî de kompîturê mesafa 100 salan kurt kir, anî 10 salan. Weha bû, ku êdî jîyan bê kompîtur nameşe. Ma ew şerê Ewropayîyan û Îraqê ne şerê kompîtorî bû?

Em Kurd jî, divê di her warî de, ji vê teknîka nûjen para xwe bigrin. Wê bi kar binin. Bi taybetî Kurdên ku îro li Ewropa dijîn. Di nav van Kurdên ku li Ewropayê dijîn de gelek kesên xwenda, teknîker, pispor, zimanzane, polîtîk û ronakbîr ûhw. hene. Ez dixwazim di vê warî de, bi tenê li ser pirs û pirsgirêkên zimanê kurdî rawestim. Gelo mirov çawan dikare bi alîkariya kompîtorê pirs û pirsgirêkên zimanê kurdî kêmbike? Ber bi yekîtiyê û santralîzekirina zimanê kurdî ve gavên pozîtîv bavêje?

## Derbederiya zimanê kurdî

Îro zimanê kurdî derbeder e. Kurdî bi 3 alfabeyên cuda tê nivîsandin: Alfabeyên Erebî, Kirîlî û Latînî. Her yek li gor xwe, xwedî gramereke taybetî ye. Hezar mixab in, di van hersê alfabeyên kurdî de, hejmara tîpan jî ne yek in. Ya Latînî 31, Kirîlî û Erebî jî ... Heta niha bi van hersê alfabeyên cuda bi du zaravayên kurdî dihatin nivîsandin: Bi kurmanciya jorîn û jêrîn. Niha dimbilî jî dest pê kiriye. Ji derî van hersê zaravayên kurdî, mirov di kurmanciya jorîn de, giraniya devokên çend herêman jî baş dibîne. Wek devoka herêma Serhedê - Kurdên Sovyetê jî bi vê devokê dinivîsinin -, devoka Badînan, devoka Cizîrê û ya Dîyarbekir û Mêrdînê...

Em zaravan li aliyekî bihêlin, bi tenê di kurmanciya jorîn de, bi kar anîna devokên cuda cuda sergêjî û aloziyeke gelek mezin derdikeve navê. Ev

yek li pêş yekîtiya zimanekî yekgirtî yê nivîskî dîwar û pingarek e. Ka em li çend gotinên ku li gor devokên herêmi bikartînin binêrin:

1- Welê, wiha, weha, wuha, wanî, wenî, wilo, wisa, wisan, wusa, usa, husa, wer, wengî, wergî, holê, hanî, ahanî...

2- Balîcanê reş, bacanê reş, firing, firingî, domat, domatês, şamik...

3- Mirov, meriv, miriv, merî ....

4- Şevşevok, şebşebokt, şevrevînk, perçemek, pêçermik, pelçimok, pelsînik, pêrcemk, peleşemk, boçermik, baçermok, balçermek, balcimk, çil, çilî, çilîçilî, çûka şevê...

Belê, her çiqaş temaniya van devokan di zimanê nivîsandinê de, bi kar neyên jî, lê dîsan, em piraniya wan di kovar û rojnameyên kurdî de dibînin. Ji ber vê yekê jî, em baş ji hevdu fêhmakin û dest bi axatîna zimanekî din dikin, ku em ji hevdu fêhmakin. Xweza di her zimanî de zarava û devokên cuda cuda hene. Heta ew zimanê ku îro li cihanê yê herî dewlemend in. Lê, zimanê wan yê nivîsê yekgirtî ye. Wan ji xwe re gramer û rastnivîsandineke (îmlayêke) yekgirtî dîtine. Divê em jî, hewla ber bi zimanê nivîskî yê yekgirtî bidin. Berî her tiştî, ji me re jî yek alfabe, yek gramer û yek rastnivîsin divê. Îro ev îmkân hene. Bi taybetî li derî welêt.

## Kompîtur dikare aloziyên kurdî kêmbike!

Kompîturê, ne bi tenê di hêla teknîkî, nivîsandin, çap û çapemeniyê de kar hêsa kiriye. Herweha di hêla gramer û rastnivîsandinê de jî, kar gelek hêsa kiriye. Niha bi gelek zimanan programên rastnivîsê hene. Piştî nivîsandina nivîsarek, mirov dikare komanda bide kompîturê ku çewtî û şaşiyên ku hatine nivîsandin wan rast bike. Kompîtur bi alîkariya programa rastnivîsê çewtîyên gotin û nivîsandinê yek bi yek rast dike, an jî bi rêz, yek bi yek wan gotinan reş dike û ji mirov dipirse ku " tu dixwazî van gotinên

çewt û şaş rast bikî an na?"

Niha ji kurdî re jî, programeke rastnivîsinî pêwîst e. Ango ferhengek. Divê mirov gotinên kurdî yek bi yek program bike û wan bike mejîyê kompîturê. Wê çaxê, heger mirov bi devoka xwe, an jî çewt binivîse, di dema rastkirinê de, bi komandoyeke program wan çewtî û şaşiyên yek bi yek rast dike.

## Zevî, pale û das hene; lê, mixab in xwedî tune!

Di kurdî de gotineke pêşiyên heye: Zevî, pale û das hene; lê, mixab in xwedî tune! Yê me jî, îro weha ye. Ziman û kultureka Kurdan ya dewlemend heye. Kurdên zana û pispore hene. Kompîtur û îmkânên aborî jî hene. Lê mixab in sazgehên me tunin. Organîze û îdarekirin tune. Bi kurtasî otorîte tune.

Ev karekî akedemîk û zanistî ye. Karê instîtû, akedemî û sazgehên zanistî yê Kurdan in. Ne karê organîsasyonên siyasî û demokratîk in. Lê, me wekî her karî vê karê ha jî tevî hev kirîye. Instîtû û akedemiyên me karê siyasî û hinek rêxistinên me yê siyasî û demokratîk jî karê akedemîk dikin.

Pêwîst e, instîtû û akedemiyên Kurd, veşerî ser program û armanca xwe ya zanistiyê. Projeyên xwe li gor program, armanca û qada xebata xwe çêbikin. Bi alîkarî û hevkarîya rêxistinên siyasî, demokratîk û kesên kêrhatî piranî û giraniya xebatên xwe bidin ser mijarên ziman, wêjeyî û kulturî. Berî her tiştî di vî warî de bibine otorîte. Pêngava yekem û ya herî girîng ji bo rêziman û rastnivîsandina kurdî bavêjin. Ji hêla ziman ve komîteyêke otorîter pêk bînin. Programa ferhenga rastnivîsê çêbikin û bikin xizmeta Kurdan. Bi çêkirina programeke rastnivîsinê dikarin zimanê kurdî ji aloziya devok û zaravayên kurdî rizgar bikin. An qet ne be, di vî warî de çend gavên pêşketî bavêjin. Ev ji bo Kurdan xizmeteke herî mezin û pîroz e. Pêwîst e jî!

*Amed Tigrîs*

## Çîrok

### DILÊ ŞIKESTÎ

Firat Cewerî

Saet sisyê şevê ew hate malê, hêdî, bêyî ku kesî şiyar bike derî vekir û kete hundir. Tesîra vexwarinê ji ser wî çûbû, lê dîsan jî hinekî dihejiya. Bi wê hejandinê çakête xwe ji xwe kir, bi dar de kir û bêyî ku lampê pêxîne, çû oda xwe ya razanê. Jina wî ya ku ji êvar de xew neketi bû çavan, her li bendî wî mabû û ji bêhedaniyê xwe qulupandibû vî alî û wî alî, gava pêjna mêrê wê hatê, xwe bi derewan li xewê danî, bêhngirtin û bêhnedana xwe jî, mîna yeka ku di xeweke kûr de be, girt û berda. Mêrik jî bo hizra ku wê ji xew raneke, hêdî pantalonê xwe ji xwe kir, paşê jî bi lez bişkoken gomlegê xwe vekirin, gomleg

ji xwe kir û ew avête wê rasta odê. Dûvre bêdeng xwe li paş jina xwe, li ser nivîna dirêj kir. Bi ketina mêrik ya nava nivîna re, weke ku jinik ji xewê şiyar bibe, xwe vezeland, bi derewan bawîşkî û bi dengê dilxerab ji mêrê xwe pirsî:  
- Tu hatî?

Mêrikê ku bîna araqê jê dihat û qet wê şevê dilê wî û munaqesê tunebû, bidengekî nizim got:

- Erê.  
- Ma saet çend e?

Mêrik kirî derew bikira û saet şaş jê re bigota, lê gava ku çavên wî li saeta li ser masê, ya ku di tarîtiyê de sor dikir, ket; Mecbûr ma ku rastiye bibêje:

- Saet sisê ye.

Jinikê bi xwe dizanîbû ku saet sisê ye. Ji xwe ji êvar de çavên wê ji wê saeta li ser maseya oda razanê neqetyabû.

- Tu heya niha li ku bûyî?

- Ez bîskê çûbûm mala Ehmed. Ji wir jî, ji bo ku birayê Resûl ji Almanya hatibû, em kêlîkekê jî çûn mala wan. Em pir bûn; ez bûm, Ehmed bû, Osman bû, Elî û hevala xwe bûn, birayê Resûl û hevala wî ya Alman bûn.

Lê paşê hate bîra wî, ku berî wê bi rojekê dîsan wilo dereng hatibû û wê carê jî gotibû, ku wan Resûl bi rê kiriye, ew şandiyê almanya, paşê jî bi hevalên komelê re li mala Osman civiyane, ji xwe re heya bi dereng sohbet kirine û dûvre gava ku xwestiyê here malê, otobus nemane, ew mecbûr maye ku li bendî otobusa şevê ya ku piştî saet yekê şevê destpêdike, raweste.

- Ne te doh got ku we Resûl bi rê kir, ew çû Almanya?

- Ma min got Resûl?

- Erê, te got Resûl! em çûbûn mala Osman.

- Hun çûbûn mala Osman?

Mêrikê ku ji westandinê nizanîbû ku çî dibêje û ji xewê pêve tu tişt nedihate bîrê, xwest ku kurt bibire û ji xwe re razê.

- Niha ez çûbûm ku, neçûbûn ku, ji te re çî?

- Çawa ji min re ne çî?

- Keçê, dev ji min berde, ez rakevim, ez bê xew im.

- Tu bê xewî le? Çima na?

- Keçê, dev ji min berde! Min ji te re got.

- Ez dev ji te bernadim. Te îşev çî

kiribe divê tu ji min re bêjî.

Mêrik weke ji bin de bê sûc be, wa bi kenekî ne ji dil got:

- Keçê ma ezê çî bikim?

- Tu zanî tu çî dikî?

- Niha tu dikarî buhtana jî têxî stûyê min.

- Na herê, melayêketê nola te dikarin çî bikin?.

Mêrik dîsan kenekî ne ji dil, kenekî xav kir.

Bi wî kenî jinik qeherî, îcar bi dengê hebekî bilind got:

- Ger tu dê vê bi min bikî, min bişîne welêt çêtir e. Ez hew karim îdare bikim. Bes e ji derdê te!

Mêrik demekê xwe li razanê danî, nebû; gotinên jinikê yên bi hêrs û bi gazin qet firsend nedida wî ku ew biniwe. Wî jî bi wê yekê dizanîbû, loma bêyî ku dîsan lampê pêxe, destê xwe avêt maseya kêleka qeryole, rahişt pakêta xwe ya cigarê, cigarek jê derxist, pêxist û çend hulumên kûr li ser hev li cigarê xist. Jinik li bendî wî bû ku tiştê bibêje, lê gava ku deng jê derneket, dîsan wê got:

- Ez zanim ku tu dîsan çûyî cem wê qehpikê, wê qehpika qûnmezî... Wê qehpika araqewxwir, wê qehpika ku nêviyê bajêr bera ser xwe dide.

Mêrik di gel ku sûcdar bû jî dîsan bi sert biser de peyivî:

- Wek kûçikan mereye! zimanê xwe weke ye kûçikan dirêj meke!

Jinikê jî bi hêrs bersiv da:

- Ku ne wilo ye, bêje, ne wilo ye.

Bi gor nêrîna mêrik ne wilo bû. Di gel ku mêrik bi bîst salan ji keçikê mes-tîr bû jî, dîsan wê jê hez dikir. Ma ku jê hez nekira, dê ji ku wilo bi saetan pê re bimaya, pê re vexwara, ew mist bidaya û pê re razaya?

Gava ku mêrik bêdeng ma, jinikê dîsan got:

- Erê, ma ne wilo ye?

- Na, ne wilo ye, mêrik bi hêrs got.

Jinik êdî baş hêrs bû, her tişt da ber çavan; hevduberdan, jihevveqetîn...

- Wê çaxê ezê jî bi riya xwe de herim, jinikê bi dengê bi bawerî got.

Mêrikê ku fêrî wan gotinên jinikê bûbû, dîsan ew cidî negirt:

- Tu bi ku de dicehemî biceheme, got û berê xwe jê guhert da ku razê.

- Ez ji te re dibêjim, jinikê got. Ger

tu dev ji van awayên xwe bernedî, ezê herim. Ez hew deqekê li vê malê disekinim. Ezê zariwên xwe bigirim û herim.

Mêrik yê ku pir westiya bû, wa hêdî di ber xwe di got:

- Here...

- Ezê herim, jinikê got û ji nav nivîna hol bû û lampe pêxist.

Mêrikê ku hê jî xwe tev ne livandibû, dîsan hêdî di ber xwe de got:

- Keçê vê şevê dev ji min berde.

- Ez ji te re rast dibêjim, jinikê bi dengê bilind û nivgiri got.

Bi wî dengê wê zaroka wan ya piçûk ji oda kêleka wan giriya. Gava dengê zarokê hate mêrik, mêrik ji nav nivîne xwe rabû, şîmaqeq bi hêz li ser çavê jinikê xist û hin çêr ji dê û bavê wê re kirin.

Lê qet ne xema jinikê bû, wê her ya xwe digot. Di wê navberê de zarokên wan yên din jî rabûn, lê bavê wan bi ser wan de qîriya û zarok dîsan bi paş de çûne oda xwe.

Saet dihat çaran, tarîtiya şevê hêdî hêdî cihê xwe ji ronahiyê re dihişt. Mêrikê ku her ji ser ya xwe danediket, kirinên xwe rast didî û li kesî din guhdarî nedikir, vê carê jî her dixwest bi ya xwe bike. Lê jina wî jî ya ku bi a wî gelekî bi înad bû, ji ser ya xwe danediket...

Wê her çiqas zanîbû, ku piştî sê zik zarok ev yeka han ne hêsan e jî, dîsan biryara xwe dabû, ku mêrik careke din vê yekê bike, ewê dev jê berde. Çend caran ew efû kirbû û mêrik jê re sond xwaribû, ku ew êdî hew wê dike. Lê wî tu caran sonda xwe bi cih netanî, piştî du-sê rojan dîsan ji mal winda dibû. Tew carinan jê ew bi şev jî nedihate malê. Şevên ku dihat malê jî, weke îşev saet di sisê an çarê sibehê de dihat malê.

Mêrik cigareke din pêxistibû, li ser qorziya qeryole rûnştibû, serê xwe berjêr kiribû û difikirî. Jinik jî herdu destên xwe xistibûn bin çengên xwe û li der ve, li nixteyek ne xuyayî dinihêrî.

Paşê jinikê berê xwe bi mêrê xwe ve kir. Mêrik hîna jî serê wî di ber de bû û kûr kûr difikirî. Jina wî ya ku karîbû di wê deqîqê de ew bida ber kêran û bikuşt, lê dikir nedikir nikanîbû jê nefret bikira. Ji xwe ku bikariba jê nefret

bikira, roja pêşî ku mêr çûbû ba wê keçikê, jinikê dê dev jê berdaya û bi riya xwe de biçûya. Her çiqas hin jinên havlên wê ew şîret kiribûn û jê re gotibûn, dev ji vî mêrî berde jî, wê dikir nedikir ne dikarîbû dev ji mêr berdaya, ne jî gava ku mêr lêdixst, dikarîbû li wî gilî bikira. Lê îşev kêr gihabû hestî, hatibû heta qirika wê. Ji xwe dilxerabiya ku îşev pê girtibû, bûbû wek gulokek mar û ketibû zikê wî. Ji dil bêtir zikê wê têşîya. Û ew hezkirina mêrê wê ya li hember wê keçikê, gotinên xweş ku ji keçikê re digotin, pê re razana wî, hemî dihatin ber çavên jinikê.

Gava ew li tiştên wa difikirî dîn dibû, aqilê xwe winda dikir. Vê carê jî wa bû:

- Serê xwe weke yê pîrekan nexer ber xwe, jinikê ji mêrê xwe re got û jê pêve nizanîbû ku çi bibêje.

Mêrik hêrs bû; lê wî jî tişt negot, di cihê xwe de bêdeng ma.

Jinik dîsan peyivî:

- Îcar ji te weye ku ew qehpika ji te hez dike? Wê qehpika ku nêviyê bajêr bera ser xwe dide, wê qehpika pîs û qûnmezîn...

- Keçê bes e! mêrik got.

- Ne bes e!

- Bes, bireye!

- Ez bes nakim! Îro divê hertişt safî bibe!

- De tu çi gûyî dixwe bixwe.

- Ji mala min here! jinikê got. Bi wê heramiya xwe nekeve nav nivîne min, nivîne min neherimîne!

Mêrik weke ku bisûcê xwe hesiyabe, deng nekir. Lê jinikê rahişt pantolon û gomlegê wî, bi hêrs avêt ser wî û got:

- Ji mala min here, here cem wê qehpikê!

Mêrik ji cihê xwe pengizî û rabû jinikê; kê dera wê kete ber wî lêxist. Ne got çav e, ne det e, ne seriye, ne pişt e; hema ku dera wê kete ber wî, wî lêxist. Her ku wî lêdixist, jinikê jî digot. Her ku wî lêdixist, jinikê jî dikir qîrîn û digot. Hersê zarokên wan şiyar bûbûn, hatibûn oda wan, ji tirsan xwe li hev pêçabûn û bi îskîn digiriyan. Ne haya dê, ne jî haya bavê ji zarokan çênebûbû, ew her bi hevdu re mijûl bûn. Nizanim çi li serê jinikê xistibû, serê jinikê şikandibû, ew xwena ku ji serê wê dihat li ser kincên wê û li hundir odê belav bûbû.

Hîn ew wilo ji hev neqetiyabûn, hebe tunebe, dê cîranê wan ji polis re telefon kiribe, di demek pir nêzik de otomobîla polîsan bi suretek xurt hat li ber deriyê wan sekinî û du polîsên dirêj, bi navmil, di gel kûçikêkî xurt û şiyar, bi lez xwe ji otomobîlê avêtin û bi êriş çûne hundir. Bi fikira ku belkî mêrik li hember polîsan rabe û tiştêkî bikar bîne, polîsekî demança xwe jî kişandibû. Lê mêrik li hember polîsan ranebû, weke ku zanîbû ku dê polîs destên wî kelemçe bikin, herdu destên xwe dirêjî polîs kirin. Polîsekî bi lez destê wî kelebçe kir, ew dane pêşîya xwe û birin otomobîlê. paşê yek ji wan polîsan dîsan bi paş de vegeriya hundir, her çiqas birîna jinikê ne birîneke xedar bû jî, polîs ji ambûlansê re telefon kir û heta ku ambûlans hat pirsên ku ji jinikê pirsî bûn di deftera xwe de not girtin.

\*\*\*

Mêrik du mehan di girtîxanê de ma, meha sisiyan ku hate berdan, jinikê doza hevduberdanê kir û bi biryara mehkemê ew ji hev hatin berdan û zarok û xanî jî bi para jinikê ketin. Mêrik jî çû ba keçikê. Keçika ku ji bîst û du saliya xwe nuh ketibû bîst û sisiyan, li nexweşxanê bi kal û pîran re dixebitî. Meha pêşî gelekî xweş bi hev re derbas kirin, gelekî ji hev hez dikirin... Ji kêfa evîna hevdu re herdiwa jî her yekî hefteyekê ji cihê karê xwe îzin girtin û bi hev re ji bo hefteyekê çûne Lanzerote yê. Ew bi şev û roj ji hev têr nedibûn. Ji çend saetên xwarinê û ketina avê ne têde, wekî din her bi hevşa dibûn, hevû mist didan, bi hev re radizan. Ne rojek, ne du roj, ne sê roj, wextê wan hefteyekê her wilo bi kêf, bi zewq, bi evîn û xweş derbas bû. Piştî ku ji tatîlê vegeriyan bi hefteyekê jî, têkiliyên wan her wilo xweş bû. Lê rojekê êvarî, gava ku keçik, an jî Maria ji kar hat malê ne wek hertim bi kêf bû. Gava ku mêrik xwest wê hemêz bike û maçî bike, Maria wa bi sarî ew maçî kir, cara didiwan jî berê xwe jê guhert. Sarbûna Maria tavilê bala mêrik kişand. Lê berî ku mêrik tiştêkî bibêje, Maria got:

- Divê ku tu ji xwe re xaniyekî bibîneî. Ez dixwazim bi serê xwe bimînim.

Mêrik sar ma. Te heft xencer lê bixista piça xwînê jê nedihat. Ev çi bû îcarê? Ma ne wan ji hev re soz dabûn

ku bi hev re bimînin û sala bê jî bi hev re herin Krêta, li wir destgirtî bibin û li wir du hefteyên xweş û bi şahî bi hev re derbas bikin. Ma qey keçikê ev hemû tişt ji bî kiribûn.?

Du-sê rojên din jî bi hev re man, lê ji hev gelekî sar, an jî keçik jê gelekî sar bû. Her çiqas mêrik dixwest wê hemêz bike an maçî bike, keçikê her xwe bi paş de dikişand an jî carê ji xwe re mijûliyek peyda dikir da ku ji mêrik rizgar bibe. Di hundirê wan du-sê rojan de jî tenê carekê bi hev re razan, ew jî ne ku jinikê dixwest, hema hema bêjin bi zorê bû.

Gava mêrik xwe da erdê û nexwest ji mala keçikê bar bike, keçikê jê re du roj mudet da û got ku ew vê carê jî bar neke ew dê ji polis re telefon bike û dê wî bi zorî ji mal derêxe. Ji ber ku mêrik gelek sal li Swêde mabû û bi qanûnên Swêd û azadiya jinan zanibû, ji xwer re zû ji destên diduwan xaniyekî xwendevanan peyda kir û barkirê. Lê piştî ku bar kir jî her keçik azad nedihîşt; bi roj bûya, bi şev bûya, her ji keçikê re telefon dikir û her carê ku telefon dikir jî nêzikî nîvsaetê dipeyivî. Û her çiqas ji keçikê re digot. "Çawan hezkirina te wilo dawî hat?" bersiva ku keçikê didayê jî her "Ez dixwazim bi tenê bimînin" bû.

Ji bo ku keçik jê pak bibe û êdî hew dengê wî bibihîze, nimra telefona xwe jî guherî. Vê yeka han tesîrek ecêb li mêrik kir, dinya bi ser wî de hilşand. Her tişt li ber çavên wî reş bû. Du sê rojan zor da cigarê û vexwarinê; hefteyekê neçû kar; dikir nedikir keçik ji bîrê nedichû.

Rojekê, danê nîvro ku li otobusê siwar bû, dît ku destê keçikê di destê xortekî Latîn Emerikayî de ye û li ber camekana dikanekê rawestane û li kincan dinihêrin. Heta ku otobus li kuçê zîvirî jî ew li ser stûyê xwe zîviribû û li wan dinihêrî.

Heya bi çar pênc mehan bi zorê wî hebekî ew keçik ji bîr kir. Lê tenêti çiqas nexweş bû. Bi tenê razê, bi tenê rabe. Bi tenê bixwe, bi tenê vexwe. Carinan jî wî bi saetan xwe li ser nivînê xwe dirêj dikir, çavên xwe bera nixteyê-ke dida û wilo bêdeng dima. Ew nebû, ku wilo dom bikira ew dê şerpeze û dîn bibûya. Şev nivê şevê rabû ji jina xwe ya

kevin re telefon kir. Bi dengê telefonê jinik ji nav nivînê xwe pekiya û bersiv da:

- Halo
- Ez im, ez.
- Xêr e, tu vê şevê telefon dikî?

Her çiqas panzdeh salan bi hev re mabûn jî, dîsan wan çend mehan ew ji hev bi dûr xistibûn; mêrik wek berê serbest nikaribû bipeyiviya. Vê carê lawik kir sedem:

- Min dixwest ez bi Temo re bipeyivim.

- Temo niha razaye û ewê sibehê zû rabe here mektebê, tu dikare sibehê piştî mektebê telefon bikî. Şev baş.

Jinikê telefon di riwê wî de girt. Ev yeka han pir zora wî çû, lê neda xuyakirin. Biskê xwe li ser nivînê xwe dirêj kir, paşê cigarek pêxist, piştî ku cigara xwe kişand, dîsan telefon kir.

- Keçê qet nebe em biskê bipeyivin.
- Emê çi bipeyivin? jinikê got.
- Li ser rewşa me.

- Rewşa çi?

- Ma nabe ku em dîsan werin ba hev?

- Ez niha rehetim, dev ji min berde.

Erê jinikê wa got, lê qet nebe ji bo zarokan be jî wê her dixwest cardin bigihên hev û carek din wek e berê bi kêf û şahî bi hev re bijîn.

- Keçê meriv carekê şaşiyê dike.

Jinikê zanibû ku ew niha hewcedarî wê ye. Gava yek zeyif dikeve, yê din xurt dibe. Jinikê jî xwe di wê deqîqê de pir xurt û bi hêz hîs kir.

Wê şevê belkî zêdeyî saetekê bi telefonê bi hev re peyivîn. Her çiqas ku mêrik xwest wê şevê here malê, yanî mala jinikê jî, jinikê nexwest û piştî wê bi du rojan bi alîkariya hin malbatên din, ew dîsan li hev hatin. Ne ji wan bêtir be jî, biqasî wan zarokên wan jî kêfxweş bûn.

Bi xwestina jinikê wan ji wî bajari bar kirin û çûn li bajarekî din bi cih bûn. Mêrikê ku bi xwe hem li welêt û hem jî li Swêd mamoste bû, dev ji mamostetiye berda, bi hevalekî xwe re ku ew jî li welêt avûkat bû, lê li Swêd li ser sosyalê derbas dibû, bi şirikatî ji xwe re restorantek vekirin. Restoranta wan ku îro yek ji restorantên bajêr ya herî baş e, bi xwarinên xwe yên kurdî navdar e. ●

## WEŞANÊN NÛ

### XELAT

Dîwana Yekem

Nivîskar: Tîrêj

Nêzî 80 helbestên Tîrêj di vê dîwanê de hatiye berhevkirin û ji aliyê Weşanên Niştîman hatiye çapkirin.

Pirtûk 214 rûpel e.

Adresa Xwestinê:

Weşanên Niştîman

Box: 7031

163 07 Spånga/ Sweden

### XWENÇE - II-

Kilam Dîlok û çîrok

Zeynelabîdîn Zinar

Nivîskarê Pirtîkê Zeynelabîdîn Zinar, di cîlda 2'em ya Xwençe de, beşek kilam, dîlok û çîrokên kurdî berhev kirine. Pirtûk 288 rûpel û ji aliyê Weşanxana Çanda Kurdî hatiye çapkirin.

Adres:

Weşanxana Çanda Kurdî

Box:161 39

103 23 Stockholm/Sweden

### DÎWANA REŞ -I-

Feqîr Ahmed

Weşanxana Kurdistan li Almanayê, dîwana yekem ya Feqîr Ahmet çapkirîye. Di dîwanê de nêzî 100 helbestên şair hetîye berhevkirin Pirtûk 204 rûpel e.

Adres: Weşanxana Kurdistan

Kurdistan Verlag

Wachsbleiche 62

D-4500 Osnabrück/ Germany

### KÛRT SOL SOSYETESİ

A. Dikîlî

Nivîskar nivîsar û rexnên xwe yê li ser ronakbîrên kurd divê pirtûkê ce berhev kirîye. Pirtûk bi zimanê turkî û 90 rûpel e. Hûn dikarin ji Weşanxana Kurdistan bixwazin. Adres li jor hatiye nivîsandin.

# Camêrdo nêmerd

## Necmettîn Buyukkaya

### KOYO BERZ

23-24-1.1984'an di Necmettîn Buyukkaya kışta dişmenandê gonîşsimitanana zindan dê Diyarbekirî di ame şêhidkerdini. 24.1.1991'an di şeş serrê ci benê pirî. Qandê vîrî arden da ey, ez wazena tay cîyanê zahf muhîman binûşna.


